الثرمن وأدوات الزينة إلى ما هنالك من احتياجات للفتاة في هذه الفترة من العمر وهي مرحلة المراهقة الشديدة الحساسية في التعامل مع كلا الجنسين، لقد تغيرت الحياة على الإنسان النازح العفري في كافة النواحي والجوانب الحياتية، فمجرد أن تصبح الفتاة في سن الرابعة عشرة يقومون بتزويجها لأول خاطب وطالب لديها للزواج، نتيجة أسباب تطرقنا لها مسبقاً في حديثنا النية هي حماية البنت من الضياع والخطأ والخطيئة متناسين أو غير منتهين للعمر البيولوجي والمعرفي والثقافي والنفسي الذي تبلغه، حين ستصبح ربة منزل ومسؤولة عن أسرة تتألف من زوج وأهله وأولاد تنجبهم وستربهم من الناحية البيولوجية والعاطفية والفكرية والمعنوية، أي بناء إنسان قلباً وقلباً، هذه المفاهيم التي ما تزال البنت بعمر الرابعة والخامسة والسادسة والسابعة عشر تتبلور لديها إلى عمر يتجاوز الثامنة عشر وما فوق، فهي لم تخوض في العمر المبكر تجارب الحياة وتحمل المسؤوليات والأعباء بعد، فاكشاف المشكلة وأسبابها وإيجاد الحلول لها أو حتى تفادي الخلافات والانهاء من جذور المشاكل بالنسبة للمراهقة لن تتوضح إلا من خلال معاشتها التجربة، إنما في سن تعتمد على أهلها ومن حولها في حال واجهت أي مشكلة، أي ما تزال غضة وعودها طري لم تبلغ في سن ما قبل الثامنة عشر عاماً من النضوج الذي يحميها هي أولاً وأسرقتها ثانياً ناهيك عن التبلور البيولوجي الذي يكون قيد التكوين .

فكيف لطفلة ومراهقة أن تربي طفلاً تحشد له نظم التربية والدول أساليباً ودراسات وأبحاثاً وبرامجاً تساعد في صحة تربية الطفل، وهي بعمر صغير على مصاعب وعواقب الحياة.

أمثلة كثيرة عن فتيات بعمر الطفولة والمراهقة تحمّلن مسؤوليات أكبر من حجم جسدها وعقلها، باترة عمرها الندي وأحلامها المستقبلية بحجج علينا الوقوف في مواجهتها وحلّ العواقب قدر المستطاع، قبل أن يحدث ما لا يمكن تحمل عقابه من شتات وانتشار الفوضى

الأفراد والمؤسسات والنخب لأضرار الطلاق على بناء شخصية الفرد والمجتمع معاً، وتقديم كل الإمكانيات والجهود لإنجاح هذه العلاقة أي (العلاقة الزوجية)، ذاك الرابط المقدس بين الجنسين والكل يحاول، لاستمرار سعادتها وتطورها.

تعد هذه الظاهرة مشكلة مركبة متعددة الجوانب تقود الأسرة إلى الاختيار الكامل وتفككها، ولا يمكننا أن نحمل الزوجة مسؤولية ذلك لوحدها، فالمسؤولية تقع على عاتق الزوج أيضاً، وآثارها السلبية لا تنعكس على الأبناء والأسرة وحسب، بل على حركة تطور وتقدم بناء المجتمع بأسره، ومن أكثر الأسباب المؤدية للطلاق وأكثرها شيوعاً في الوقت الحالي بين المجتمع العفري في مناطق النزوح، الزواج المبكر (زواج القاصر) بعمر تحت السن القانوني قبل بلوغ الثامنة عشر عاماً، لذا يجب علينا التركيز ومجديّة على هذا النوع من الزواج خاصةً بطروف غير عادية قاسية جداً مختلفة جذرياً عما كانت في عفرين، ظروف فرضت طقوساً للعيش لا تشبه الحياة السابقة التي كان يعيشها ابن عفرين في منطقته، وبالأخص العائلات الفقيرة مادياً وتعليمياً وثقافياً واجتماعياً، باتخاذها الحلول العشوائية والمرتبطة في ظن واعتقاد أنه إنقاذاً للفتاة من براثن الفقر والخوف والانحراف والجريمة والعار، لذا وجب علينا الانتباه جيداً والتفكير ملياً بما ستؤول إليه الأمور عند زواج القاصر، وتكمن الكارثة عندما يصبح قانوناً ودستوراً تستسهله الأغلبية كنظام حياتها حتى تصبح هي الأخرى ظاهرة اجتماعية عامة، وهذا يضعنا أمام مرض - بالأحرى وباء- ينخر في بنية المجتمع رويداً رويداً بنتائج السلبية على الأسرة والمجتمع حتى ينهار، ويعود ازدياد هذا النوع من الزواج إلى التغيير من ناحية الظروف الاقتصادية الغير مستقرة والسكن الجماعي لأكثر من عائلة في منزل واحد وقلة فرص العمل، مثقل التأزم المادي كاهل الأهل الذين لم تعد باستطاعتهم تلبية مستلزمات بناتهم كالمطلوبات المادية من ألبسة باهظة

والأمراض النفسية والجريمة، بذلك انخيار المجتمع. وفيما يلي نعرضُ أحد النماذج:

فتاة لم تبلغ من العمر السابعة عشر من العمر قامت عائلتها بتزويجها من شخص يكبرها بخمسة عشر عاماً، بالرغم من أنها كانت تمتلك موهبة أدبية وتفوق في دراستها لولا أن وأدت ظروفها الأسرية موهبتها بزواجها في هذا العمر، الذي تحضّر فيه للشهادة الثانوية ومرحلة الدراسة الجامعية وتدرّب كيف لها أن تنجح في عالم الكتابة والأدب.

كان بإمكانها أن تكون مشرّعة شاعرة تبلغ مكانة أدبية عالية، خاصة وأنها تكتب باللغة الكردية ولديها إلقاء شعر بأسلوب راقٍ، فهي من بيئة اجتماعية بسيطة جداً ومنغلقة اجتماعياً من واقع العادات والتقاليد القاتلة للمرأة وحياتها الاجتماعية المعتمدة هذا المفهوم الذي ترعرعت أسرتها عليه، وهو إن بلغت الفتاة الرابعة عشر عليهم تزويجها بسبب خوف الأهل والحفاظ عليها، كي لا تغرق في عالم التواصل الاجتماعي، فقد أصبح أنت متواجداً لدى كل عائلة خاصة في المجتمع الشرقي المعروف بالجهل في هذه المرحلة العمرية الحساسة جداً، ذلك بسبب عدم وجود وعي للتأثيرات السلبية والخطورة التي يمكن أن يسببها عدم وجود ثقافة جنسية توعوية تثقيفية بين المجتمع، كما يقال: (كل ممنوع مرغوب).

بالزواج المبكر في سن القاصر يعتقد الأهل أنها قاموا بإنقاذ ابنتهم، لا يعلمون بأنه دمارٌ لحياة الفتاة وتدمير لمستقبلها ومنعها من تحقيق طموحاتها العلمية والثقافية والفنية والأدبية والأهم من كل ذلك نضوج شخصيتها لنفاذي ما قد يتسبب في تدمير حياتها.


هنا لا نقول أن الهاتف غير ضروري ومضر، التعامل الغير صحي معه هو سلبي، بالعكس التطور والتكنولوجيا أحد أسس النجاح، لكن المطلوب أن يعلم الأهل أنانيتهم كيف يتم استخدامه بطريقة إيجابية وصحيحة بعيداً عن السلبيات الموجودة فيه، فالهاتف بحذ ذاته كارثة إن أُستعمل بشكل سلبي حين نشاهد

الهاتف بأيدي الأطفال والمراهقين دون تمهيد لاستخدامه إيجابياً، فالزواج لا ينقذ الفتاة بقدر ما يحميها التربية والتوعية للتعامل مع كل شيء بعقلانية ليس الهاتف وحده، وحتى بيولوجياً وفيزيولوجياً لم تنضج بعد بشكل صحيح لتكون قابلة للزواج، عندها ستعرض لمشاكل كثيرة ففي الرابعة عشر لم يكتمل الرحم بعد متعرضة لخطر الموت أثناء الولادة، وقد يولد الطفل قبل وقته لعدم تحمل جسدها يموت أو يكون معوقاً لأسباب تتعلق بقلّة ثقافتها الصحية لها ولجنينها.

فزواج القاصر بمناطق النزوح جريمة بحق الأسرة العفرينية وبحق كل المجتمعات، وسبب يؤدي إلى الخيانة الزوجية، فعندما تكون الأم غير واعية ثقافياً وفكرياً وعلمياً وجنسياً ونفسياً لن تستطيع حلّ مشاكلها الزوجية وتربية طفل سليم من كافة النواحي، لن تعرف حتى مشكلة طفلها إن كان منعزلاً منطقياً على نفسه وغيرها من الأمور الكثيرة، لأن رعاية الطفل ليس بالسهلة، حتى التعامل مع عائلة زوجها، فإن كانت مدللة لدى والديها فقد تنزعج بكلمة من عائلة زوجها، وتعتبر ذلك بداية شجار ومن الشجار إلى مشاكل كبيرة وبعد ذلك تتفاقم المشاكل لمرحلة الطلاق، فزواج القاصر هو زلزال يزلزل العائلة الصغيرة والكبيرة والمجتمع بأكمله، فالأسرة هي الأساس التي يُبنى عليها المجتمع، هو المنبع الذي يتدفق منه الأفراد الذين يبنونه، لكي يكون هذا المجتمع صحي وسليم وألا يتزعزع كيانه يجب أن يكون هناك شروط صحية وسليمة لبناء هذه المؤسسة الصغيرة، والأسرة التي بدورها تتحول إلى حي وبعد ذلك إلى مدينة وبالتالي تتحول إلى بلد بكامله، يجب أن يكون هناك أساس صحيح وبأن لا تكون جذورها على الأرض فقط بل يجب أن تكون متعمقة ومتشبثة، لأنها ستكون مثلها مثل أي مياه سطحية سوف تجف من حرارة الشمس وستكون سهلة الاقتلاع وسهلة الذهاب مع أي ريح تهب عليها.




هه‌سەم هه‌سێن - Heysem Hisên



■ فیان خلو - Vîyan Xelo



وليد الحسيني - Wafid El huseynî



مناف عثمان - Menaf Osman

Horê Heftêr, yekemîn kes li gund niştecih bûye. 2 kurên wî hebûn; Mihemed û Şêxo û ji wan gund şên bû. Xelkên gund hemû ji eşîra Roşî ne û gelek gundên derdorê ji heman eşîrê ne.

Gundê Heftêr li ser cihekî bilind hatiye avakirin, nêzî 5 km li bakur rojavayê çîyayê Keleşîr dikeve. Li başûrê gund, gelîyê Kanî Sorkê û çîyayê Keleşîrê, li rojava Erdê Sor, gundên Şêxorzê û Jarê, li bakur çîyayê Gewrikê, gudê Kurdo û li rojhilat Gelîyê Rêz, gundên Ebîdan û Mersa dikevin.

Gund ji 45 xanîyan pêk tê û nêzî 1000 kes lê dijîn. Ji ber koçberîyê, gund fireh û mezin nebû, lewre gelek kes li bajarê Efrînê niştecih bûn.

Di asta yekemîn de, xelkên gund debara jîyana xwe bi çandinî û xizmetkirina zevîyên zeytûnan dikan, her wiha hin malbat sewalan jî xwedî dikan.

Guvaşgehek û 2 kergehên dirûnê di gund de hebûn, nêzî 10 kesan tê de kar dikirin. 4 kargehên dirûnê û kargeheke pêlavan li Efrînê hebûn, nêzî 70 kes ji xelkên gundê Heftêr tê de dixebitîn. Nêzî 20 kesan di sazî û desteyên Rêveberîya Xweser de dixebitîn. Lê piştî dagirkirina kantonê bi giştî û gundê Heftêr bi taybetî ev hemû çalakîyên mirovî

hatin rawestandin, gelek kes ji xelkên gund neçarî koça bi zorê bûn.

Xelekên gundê Heftêr di nava têkilîyîn baş û bi aheng de bûn, lewma di cejnan de hemû xelkên gund serdana hev dikirin û pirsgirêkên xwe yên civakî çareser dikirin.

Arê Çoplîyê, weke kargeheke ji bo çêkirina cebilxaneya çekan di serdemên kevin de bikar dihat.

Îbramê Heftêr oldarek bû di heman demê de kesayeteke civakî bi bandor û cihê rêzê bû li ba hemûyan.

Muradê Heftêr jî zanyarekî ola Îslamî bû, ji bo civaka xwe gelek ked û xebat kir. Dibîstana Ş. Cuma dibîstaneke hevbeş e di navbera gundê Heftêr û gundê Ebîdanê de. Komîna gund bi navê Ş. Dîrok e.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku di serdema komkujîya Ermenîyan de sala 1914'an, gelek kesan ji Ermanan serî li gundê Heftêr dan, û xelkê gund ji alîyê xwe ve malovanîya wan kir, pêşwazîya wan kirin û di nava xwe de hewandin ta asta ku xanîyek ji wan re ava kirin.

Tê zanîn ku strana (Hemo) ku yek ji stranên bi navûdeng e li Efrînê, li ser Ehmed ango Hemkê Heftêr bû ku di sala 1930î de jidayîk bû û sala 1961ê çû ser dîlovanîya Xwedê, ji ber ku ew kesekî jîr û leheng bû ev stran li ser hat gotin.



■ Gundê Heftêr

Serbest

Gundê Heftêr



Şerîf Mihemed- Welîd Bekir

**Gund ji 45 xaniyan pêk
tê û nêzî 1000 kes lê
dijîn. Ji ber koçberîyê,
gund fireh û mezin nebû,
lewre gelek kes li bajarê
Efrînê niştecih bûn.**

Serbest

Gundê Heftêr, girêdayî navçeya Bilbilê ya kantona Efrînê ye, 12 km li başûr rojhilatê bajarokê Bilbilê û 50 km li bakur rojhilatê bajarê Efrînê dikeve.

Tê gotin ku kesek bi navê Horê, heftarek avête erdê û kuşt. Piştî navê wî bû Horê Heftêr, her wiha navê gund

ji bû gundê Heftêr.

Nêrînek heye dibêje ku şêxler ango oladarên gund, li ser piştê heftêr diçûn gundê Bablîtê li ba oldaran dicivîyan û zikir dikirin.

Nêrînek din heye dibêje ku navê gund ji ((Heft dar)) hatîye ku li cihê gund ê niha 7 dar hebûn.

berhemê de, divê mirov ji ku dest pê bike? Ji hunermendê berhemê, yan ji berhemê? Yan jî, ji şert û şûtên dîrokî û civakî ya wê derdorê ve?

Divê mirov bizanibe, hunermend -nivîskar- jî wek her mirovî, mirov e -însan e. Ji bo vê jî mirov berhema wêjeyî li gor şexs û karakterên nivîskarî divê nenirxîne. Divê rexnegir çêker be, xirabker nebe.

Sûd û Xwêşiya Wêjeyê

Îmge anku xeyal bi kultûrê ve girêdayî ye. Kultûr/çand figoran diafirîne û dike îmge. Xeyal li dijberê raştîyê tê afirandin. Xeyal caran dikare bibe raştî jî, lê bi piranî wek xeyal dimîne. Gelek xeyal di serê mirov de, di wêjeyê de dibe îmaj. Di navbera raştî û xeyalê de her tim nakokî heye.

Don Kîşot xwe wek şovalyekî dibîne. Baskê aşên bayê jî wek dijmin dibîne. Di efsaneyên kafkasan de Teyrê Sîmurg heye. Teyrê Sîmurg motiveke xeyalî ye, hatîye afirandin.

Edebîyat afirandina îmgeyên xweza, civak û mirovan e. Ev afirandin bi xeyalî û bi metoda estetikî tê pêkanîn. Nivîskarên wêjeyê bi uslûb û şîroveya xwe însanan, xwezayê û civakê dinirxînin û di der barê wan de zanîne pêşkêşê xwendevanan dikin. Hoştayê teorîya sosyal civakî Fredrîk Engels ji bo wêjevan Balzac dibêje “Ez tiştên ku ji Balzac fêr bûm, ji dîrokzanên profesyonel, ji îstatîkvan û ekonomîstan pirtir bû.” Zaniştîya ku wêjevan pêşkêşî xwendevanan

dike, di nav civakê de zû belav dibe û bandorê li civakê dike. Destanên Homeros, Pîyesên Shakespeare, helbestên Hayam, romanên Tolstoy û Doştoyevskî, kurteçîrokên Çexov sedsalan di nav neteweyên cîhanê de belav bûne, tene xwendin û li ser mirovan bandorê pêk tîne. Mirov bi saya wêjeyê têkilîyên di nav civakê de, têkilîyên însanan û xwezayê, jîyana sosyal, civakî, şerên navxweyî û şerên di nav gel û neteweyan de, fikir û ramanên mirovan, xeyalên wan, evîn û hesûdîyê, bêrîyê, tirsê, êş û dîlşadîyê fêr dibe. Mirov bi saya wêjeyê xwe nas dike, civakê nas dike, têkilîyên civakî, sosyal fêr dibe.

Wêje hêzeke estetikî dide mirov ku ev jî ji bo bextiyariya mirov her dem pêwîst e. Hezkirina jîyanê, daxwazên ji bo paşerojê, kar û xebatên pîroz, bawerî û berxwedana jîyanê di berhemên wêjeyî de gelek xweş tene şîrovekirin, bi deta tene qalkirin. Bi saya berhemên wêjeyî asoya xeyalên mirov berfireh dibe, zimanê mirov dewlemend dibe, axaftina mirov raşt û dirûst dibe, hişê mirov vedibe. Wêje mirov ji teng fikrandinê, ji dogmatîkîyê, ji hereketên şematîk xilas dike, mirov dike bi tolerans, bêhn fireh û parazvanê azadîya fikrî.

Xwendevan dema berhemeke wêjeyî dixwîne, di leheng yan jî figurên berhemê de xwe dibîne, karakterê xwe dibîne, xwe dişibîne wî/wê leheng yan figurî. Bi lehengê berhemê re diêşê, dikene, hêrs dibe, aram dibe, yanî dibe şîrikê gelek tiştên wî/wê.

hîkayekirin. Di nav van têkilîyan de; ji pirsên ruhî hetanî rewşa aborî û gelek mijarên din hene. Di hîkayekirina evîndarîya du ciwanan de munasebeta civakî ya wê deverê, wê herêmê heye. Roman vekirin û derketina holê ya munasebeta civakî ye. Roman keşîfekî nû e, îcatekî nû ye. Teknîka avakirina wê tim tê guherandin, tê nûhkirin. cudahiya di navbera roman û çîrokê de nîcel nîn e, nîtel e, wesf e.

Taybetîyeke roman û çîrokê ev e ku; bi meraq tê xwendin. Meraqa girîng jî, gelo dê dawîya wê çawa bibe ye? Di wêjeyê de meraq cihekî pirr girîng digire. Yê ku çîrokê dide xwendin meraq e. Çîrokên devkî jî ji ber meraqê tên guhdarîkirin, çîrokên nivîskî jî ji ber meraqê tên xwendin. Çîrokên “Hezar û Yek Şev” ji ber meraqê hatiye guhdarîkirin û di dema de me jî tê xwendinê.

Di çîroknivîsê de bikaranîna metoda meraqê herî baş ji alî nivîskarê Amerîkî Jak London ve hatiye bikaranîn. Deştpeka çîrokên Jak London li ser meraqê hatine avakirin. Xwendevan ji bo ku di serîya-deştpeka- çîrokê de meraqa bûyerê dike -û gelo dê dawî çawan be?. Lewma jî hetanî dawî wê çîrokê dixwîne.

Mînak: Çîroka Jak London a bi navê “Yê Meksîkî”, di serî de meraqek girîng heye. Xortekî 18 salî-Rîvera-diçe dikeve nav rêxistinêke şoreşger. Di wê rêxistinê de tu kes Rîvera nas nake, kesek bi derbasbûyina jîyana wî nizane. Wexta ku pere -dirav- ji rêxistinê re pêwîst -lazim- dibe, ev xort -Rîvera- pere tîne dide rêxistinê.

Berpîrsîyarên rêxistinê ji vî xortî şûphe dikin, dibêjin qey ev xort ajanê dewletê ye û hatiye ketîye nav wan de.

Xwendevan jî gava vê çîrokê dixwîne di serî de meraq dike; gelo derbasbûyîna vî xortî çawa bûye? Ev xort çima ewqas bi rêxistinê re alîkarîyê dike, Gelo ev xort van pereyan ji ku tîne, Ev xort bi rastî jî ajan e, yan na?

Di bûyerên çîrokê de metod ev e; xwendevan di serîya bûyera çîrokê de meraq dike, paşê jî ew meraq di nav pêvajoya bûyera çîrokê de tê pişkavtin û ew meraqa xwendevan bi rohnîkirina çîrokê tê fêmkirin û wê demê xwendevan gava sedema meraqê fêmkirî dike, dibêje ahan... nexwe/demek ev bû. Di çîroka “Yê Meksîkî” de jî xwendevan pêşî meraq dike ku ev xortê alîgirê şoreşgeran wê pereyî ji ku tîne, paşê fêmkirî dibe ku, ew xort diçe maça boksorîyê dike û pereyê ku ji wê qezenç dike, tîne dide rêxistinê.

Di wêjeyê de rexne, babetekî girîng e. Ez bawer im li ser rexnegirîya edebî herî pirr nivîs di kovara Helwestê de hatiye weşandin. Edebîyat bi rexneyên edebî pêş ve diçe. Çi heyfe ku di nav Kurdistan de rexnegirên wêjeyê yên pîşpor hindik in. Hinek kes hene li ser navê rexnegirîya wêjeyî hesûdîyê dikin, dilreşîya xwe nîşan didin. Feydeya kesên wiha nagihêje wêjeyê. Lê hinek kesên dilpak jî hene ku dema li ser berhemên wêjeyî dinivîsin, nîrxandinên îlmî zanîstî dikin. Nîrxandinên wiha edebîyatê pêş dixê. Ji nivîskarên berhemên wêjeyî re dibe alîkar. Ji bo dewlemendî û bedewîya berhemê dibe rênîşandan..Di analîza berhemek wêjeyî de, di hûr lîstîkê de,

nabe. Lê dewlemendîya zimên jî bi têkilîyên bi edebîyatê ve girêdayî ye. Bikaranîna zimanê wêjeyî, ew ziman hîn pêş dikeve, bi goşt û xwîn dibe, bi ruh û can dibe, jîndar dibe û pêş ve diçe. Yê ku di berhemên wêjeyî de ziman bi hoştatî bi kar tîne û bi zimanekî dewlemend bûyeran li hev dihûne, nivîskarê/a berhemên wêjeyî bi xwe ye. Nivîskarên berhemên wêjeyî di her demê de, bi kultûr û zanyariya xwe zanayên dema xwe ne.

Di hemû berhemên wêjeyî de ramanek, têzek heye, mesajek heye. Kî dikare bibêje ku berhema nemir a netewa Kurd, Mem û Zîn bê mesaj e, bê raman e, bê têz e.

Çalakîyên wêjeyî bi afirandina berhemên wêjeyî xwe dide xuyakirin. Di her demê de yê ku bi hêzên tarî re şer dikan, têdikoşin nivîskar, rewşenbîr û hunermendên pêşverû ne. Di vê têkoşînê de, di gelek welatan de bi sedan nivîskar û rewşenbîr dikevin zindanan, hinek ji wan jî têne kuştinê. Berhem û jîyana wan nivîskaran ji neslên dahatû re, ji paşerojê re dibe mînak.

Di nirxandina wêjeyê de tiştê herî bi xeter sektarîzm e. Sektarîzm şêweyekî nihilîzmê ye. Hemû tiştên berê înkâr dike û dixwaze dîtînen xwe bi zorê bide qebûlkirin. Rasteqînî bi înkârê dernakeve holê. Rasteqînî bi yekîtiya nakokîyan tê fêmkirin.

Dogmatîzm li pêşberê pêşveçûna wêjeyê asteng e. Di dogmatîzmê de guhartin û xwenûhkirin tune ye. Kesên dogmatîk di nav lêgerînê de nînin.

Di wêjeyê de ala herî ber bi pêş realîzma nûjen/modern e. Realîzma

nûjen yek alî nîne, pasîf nîne, aktîf e, bi tesîre, fêr dike. Realîzma nûjen xwe ji dogmatîzmê û demagojîyê diparêze. Realîzma nûjen, başîyê, rindîyê û bedewîyê derdixe pêş. Ew her tim hêvîyê dijîne. Di wêjeyê de realîzm, bûyerê, mewzîyê, wakîyayê wek xwe, di nav herikandina bûyerê de dayîn e.

Hinek berhemên wêjeyî hene, ku ji bo mirovên di dema xwe de hatine nivîsandin. Lê ev berhemên nemir hem ji bo wê demê, hêm ji bo dema me û hêm ji bo dema paşerojê jî berhemên edebî ne. Mem û Zîn, Don Kîşot, Şer û Aştî û... hwd, berhemên wiha ne.

Wêje; ji helbestê hetanî çîrokê, ji daştan û menqîbeyên olî hetanî romanê tê avakirin. Ev hemû şaxên edebîyatê bi hevdu ve girêdayî ne û bingeha wan li ser hunera çîrokkirinê -hîkayekirinê- ava dibe. Helbest jî, roman jî, şanotîyatro- jî, senaryo jî, hîkayetkîrin e -çîrokkîrin e. Ji xwe hunera wêjeyî, qalkîrin e, hîkayekîrin e. Cudahîbuyîna wan di teknîka hîkayekîrinê de ye. Wêje biriqandina jîyana jîndaran e. Di wêjeyê de tîp û qarekter cihekî girîng digire.

Di nav şaxên wêjeyê de ya herî kevn helbest e. Helbest wek nesîr dûz nîne. Bi pîvan e, bi wezn e. Helbest bûne kilam û şîran, bi muzîkê hatine xwendin û gotin.

Roman hêj nuh e. Sê asir berê hatiye avakirin. Di sedsala 18 û 19an de gihaştîye kemala xwe. Roman hêj jî ber bi pêş ve diçe, bi teknîkên nû dikemile. Di romanê de têkilîyên mirovan -însanan- yê bi hevdu re û bi xwezayîyê re bi hawakî berfireh û bi hûrgilî têt qalkîrin, bi hunerî têt

Nirxandina Wêjeyê



Luqman Polat

**Nirxandin edebîyatê
pêş dixe, Ji nivîskarên
berhemên wêjeyî re dibe
alîkar. Ji bo dewlemendî
û bedewîya berhemê dibe
rênîşandan..**

Serbest

Berîya 1980'yî berhemên wêjeyî yên Kurdî kêr bûn. (Li vir mexsed Kurdistana Bakur e.) Nivîsên li ser edebîyata Kurdî pirr kêr -car carna- dihatin weşandinê. Lê piştî 1980'yî û bi taybetî jî di salên nabeyna 1985 û 1995'n û piştî sala 2000î heta sala 2020'an, gelek berhemên wêjeyî -li welêt û li derveyî welêt- hatin afirandin, bi sedan nivîsên li ser wêjeyê -bi gelemperî wêje û bi taybetî jî wêjeya Kurdî - hatin weşandin.

Ziman, çand û wêjeya neteweyekî hebûna wî neteweyî ne. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, wêjeya xwe


winda bike, ew bi xwe jî winda dibe, di nav neteweyên din de dihele, asîmîle dibe. Yên ku neteweyan li ser lingan dihêle ziman, çand û wêje ye.

Wêjeya Kurdî ya devkî pir xurt û dewlemend e. Di van salên dawîn de, wêjeya nivîskî jî ber bi pêş dikeve, pêş ve diçe, dewlemend dibe û her diçe dikemile.

Wêje di jîyana gel û neteweyan de bûyerên ku li ser jîyana civakî bandora xwe dike, bi hawayekî hizn, heşt û bi sîmgayan, bi taswîran, bi gotinan an jî bi nivîskî têtê pêşkêşkirin. Di wêjeyê de ziman bingeh e; ziman nebe wêje

Ez Qasim im

Ez li Biradostê asê nema bûm
 Bi peyatî ber bi rêya azadîyê
 ve dimeşîyam
 Çi qas dirêj bû jî, ez
 nediwestîyam, li ber keleman
 radiwestîyam
 Meşa hêja û binirx bû
 Şopên xeyalên min li ser
 sînga çîyayên xwedewendan
 wêneyek ji hêvîyan
 dineqîşand
 Ew çînik jî bejna wan çîyayan
 xweşiktir dikir
 Ez Qasim im



Cemîl Xoce



Her dimînîm ez



Lîlav Elî



Di tarîtiya şeveke sar
 zivîstaneke seqem
 û dîrokeke bê bext de
 Dergûşa hesreta welat di dîlnazikîya
 tîxên dilan de
 Hejandin
 Dîroka evîntîya hezar salan li ber
 çavên yara delal bi hovî û bê dûman
 Sotandin
 Deşt avêtin birîna dil û bi
 bêdengîyekê qîrandin
 Li ser kenarê bendewarîyê li benda
 rojek ji aştiyê
 hêlandin
 û her ku jîyanê guhê xwe da sînga
 dilê got
 ez im, çiyayê Kurmênc im
 Bûka welat im
 Efrîn im

Ev dezgehên berpirseyar
Şerim nakin, ji kar û bar

Beşek ji me kurdên (zana)
Dengek nedan pakrewana

Ev çend ferman ser ola min
Vîn dibe hêz bo tola min

Şingal tevde bûye agir
Hîn em ji hev dikşînin girr

Bombe barîn wek baranê
Armanc koka berxwedanê

Lê ev pîlan naçin serî
Kurdo bes e, bes berberî

Min ji xwe kir pirsek ji can
Çima xwîna te ma arzan?

Ev çi kerb in, ev çi kîn e
Cîhan bê deng lal dimîne

Gunehê te ku tu baz î
Wekhevîya rast dixwazî

Sinc û zana bibin rêber
Jîna mirov zû bînin der

Çendê salan mane bindest
Doza mezin şad û serbest

Bes binala warê derdan
Va li dar e şoreşa can

Barkin şevên reş û tarî
Gul û nêgiz li te bibarî

Tev bilivin ji dil û can
Hredem bijî warê kurdan

Gurm e Gurm e



Ebûdê Mexso

Hate şevêk reş û tarî
Gurm e gurm e ser vî war î

Warê aram û lehngan
Şîyar bûye li ser dengan

Dengên dijwar, topên tirkan
Gerdûn hejî, kanî wijdan?

Ev bêdengî ne qeder e
Pêwendî ne, çav li ser e

Ser xwîna min dikin bazar
Tev dibin yek, doşt û neyar

Dane ber xwe xaka pîroz
Deşt şewitîn, tev kend û koz

Qendîl û zab warê min e
Neyar bişkê barê min e



Veger

Dem bûye canim êdî wer, li qesr û qûnaxan veger
Ger nedî eşq û nesîbek, dil bibî gel xwe û her

Hindik û bêvac qe nîne ew, heyamên geşt û kar
Her derek bot bi rêz e, xanî û bexçê bidar

Vê tenahîya bêçar e, dil ji singê kir ferar
Min ji ber wê îletê, her peyv di guh de, kir guhar

Cama dil te, ez dizanim min bi tundî ew şkand
Hêvî û omîda jînê ta perengjî min tefand

Tuxreya reşî li singê ku bi dest xwe min peland
Gel hinarkên wî rûyê te, sed hêvî tê de mi çand

Bê zulfên sîya li çeşman ku li ber kezîyan dimeş
Qehweya sibhê binoşim, bê te ew qet nabe xweş

Wer ji du çeşmên xeyalî, ref têne mezraqê tûj
Sohtime b'arê vîyanê, goşt nema hstî dikoj

Sotemîna arê min tu, ger nebî dil nade soj
Ger neyên gezme ji çeşman, Kurte mezraqên qeseb
Çon ez ê pê heşt bibim, ew padîşaha xemrî leb

Nahêle biçne ji bîrê, ta mirin dêm bendewar
Ew peyala ava eşqê ku ji destan vexwar



Yûnis Bahram



Vê şevê ne tenê azayên te didim hev,
 Girnijîn û awirên Ramîn , Qazîyan jî ji ber sêdarên
 bê bext
 Didim hev,
 xwêdana xwe jî ji bergên ne dîyarîyê
 Didim hev .

Vê şevê ez dirijim ji meşka mêranîyê û navtêdanê
 Û dengê lingê rihê min jî li sûra Amedê, vedide
 Vê şevê ez nikarim li te bigerim kuçe bi kuçe
 Kanî bi kanî û bajar bi bajar
 Lê dikarim heştiwên pêşeroja te bidme hev ji şkefta
 DU DERYÊ û serê dîroka bêbext û rûkal deynim
 ber pîyên mindalên te
 Tenê ez dikarim te berdim nêv cerg û mêlakên
 Hevê helbestê ,vê şevê.

De were bera ez nemrim mîna Fêrîk Usiv di hisreta
 dîtina te de

Ne jî mîna Şikoyê Hesên Li tixûbên te bigerim li
 pêjna rewîyekî

Were tu çawa tê were:

Siwar be, Peya be

Hêşîn be ,Zuha be

Mirin be ,Xweza be

Xatûn be,Bermal be

Were ...

Vê şevê ez Xanê Xanan im.
 pêjna pêsîrên te dikim Vê şevê...

Hêvîya Baskoyî

Jîyana min têra hezkirina te nake, kubara
 bedew
 Gula bê mirad!
 Tenê dikarim di xewnên şevên te de bigerim
 Sîpan bi sîpan
 Gelî bi gelî û mîna dengê Meya Egîdê Cimo
 xwe bipêçim
 Li rihê deşta heranê,
 Tenê dikarim bibim çaroxa lingê Ciwan ,
 Germîyan û Zozanên
 te li xwe vebestim vê kêlikê,
 Tenê dikarim bibim buhareke bê tirs
 li Mêrga Şemamê û xura dilê xwe jî
 bişkînim ji kezîyên Kejê
 Tenha ez çuqlîyekî şkestî me ji sînga dareke
 Qizwanê
 Ne bilbil hogirî min tîn, ne jî sira bayê
 evînê min divejîne
 Heştê min vê şevê Cembeliyê piçûk e bera
 êdî min bilorîne,
 min bixapîne dayika min:
 “de lorî lorî Cembeliyê lorî lorî ...”



Rakan Hisso



Sara...



Beşîrê Mele Newaf



Çivîka dara bi tenê

Sara, çavbeleka peravê Feratê

Bilndayî ji temenê teyî picûk re

Nefreta dîrokê

têra reşkirina riwê kujerên te nake

Sara, bilbizêqa demsala sêwî

Çavên dêlegurê bi gernejîna te bar nebû

Bila nema baran bibare

Kevir bi ser pereştgehan de werbin

Sara, ji Sara re bêje çima li Ruhayê

vengerya?

Deşta Heranê wê qala kîjan xezalê bike?

Bi dû her pêxemberekî de kedxwirek heye

Û bi dû kuştina gulekê de dilbikulek heye

Sara çivîka dara bi tenha

Yekta serê zivîstanê bi dû Qulingan de ye...

bûn. Min bi destê Şêro girt û jê pirsî: Hûn di vê odeya reş de çi dikin, Ka dîya we Fîdan? Şêroyê zarok keserek kişand û got: Xaltîka delal ev ne ode ye ev gor e. Me dê û bavê xwe winda kirine, em niha bi tena xwe di vê gornê de li benda wan in. Xweda ji me re got: Ez ê li demeke nêzik dê û bavê we ji we re bînim. Niha li vir bilîzin da ku ez wan ji we re bişînim. Hûn zarokên buhiştê ne.

Gotinên Şêro ez matmayî kirim. Gotinên wî hiştin ez bi xwe re bipeyivim. Ma van zarokan çawa di vê gorna reş de Xweda dîtî, ma Fîdanê çawa zarokên xwe bi tenê li vir hiştine? Wisa nabe divê ez van zarokan bi tenê li vir nehêlim. Divê ez wan bibim ba Fîdanê, helbet niha ew xemgîn bûye û li zarokên xwe digere.

Min hewil da bi destê wan bigirim û wan bi xwe re ji wê gornê derxînim, lê her ku min bi destê yekî ji wan digirt, ew ji nû ve dibûn ronahî û ji nav destên min difirîn. Zaroka piçûk Dîlanê dagirî, bi dengê kelegirî ji min xwest û got: Xaltîka delal, em nikarin vegezin ba dê û bavê xwe. Xweda rêdanê nade me da ku em bi te re vegezin ba dê û bavê xwe. Xwezî tu biçî dê û bavê me ji me re bîni, me pir bîrîya wan kirîye.

Girîyê Dîlanê hişt ku ez jî bigirîm. Min rondikên xwe li ser dêmên xwe meyndin û ji wê odeya weke gorê derketim. Dema ji cem wan derketim, derîyê wê gornê yekser li pişt min bi xwe hate girtin. Qêrîn û girîyê Dîlanê hîn ji wê gornê vedengek bi êş li wir belav dikir. Min hewil da ji nû ve derîyê gornê vekim, lê min nikarîbû vekira.

Bi navê Fîdanê min bang û hawar kir. Fîdanê hawara min bihîst û ew ber bi min ve bezî. Wê ciline reş li xwe kiribûn û çavên wê ji girî agirekî sor di wan de veketî bû. Hema ez hembêz kirim û got: Kanîn , Şêro, Şîlan, Dilêr û Dîlanê, Te ew dîtine? Min ew winda kirine, bêje kanîn ew.

Min got: Metirse, ew li pişt vî derî ne. Were bi hev re em vî derî vekin û wan jê derxînin.

Bi zorê min û wê ew derî vekir, lê tenê vedeng di odeyê de mabû. Ode bi giştî rûxandî bû, zarok windayî bûn, tenê qêrîna Dîlanê û girîyê wê dihate guhên me û wê bang dikir: Anê û bavo ez ditirsim, min bi tenê mehêlin.

Vedenga dengê Dîlanê girûzî bi laşê min xist û ez ji xew veciniqîm.

Dema li xwe şîyar bûm, li dora xwe nêhirî û min nas kir ku ew dîmen bi giştî xewn bû. Bi vê yekê ez şad bûm. Pir baş e ku dîmenên xemgîn tenê bimînin xewn û derbasî raştîyê nebin.

Min xwest dîsa vegezin xewê, lê berî ku ji nû ve dest bi xeweke nû bikim, dengê teqînekê li nêz hat û qêrîn ji mala cîrana me Fîdanê hat. Em giş pêxwas ber bi mala wê ve bezîn.

Li mala Fîdanê heman dîmena min di xew de dîtibû li pêş çavên min bû raştîyek. Odeya ku zarokên Fîdanê tê de xew kiribûn, bi giştî hatibû rûxandin û termên zarokan di bin kaviên hilweşîyayî de li destên dê û bavê xwe digirîyan.

Gîyanên piçûk di şeveke tarî de bê xatirxwestin koç kirin û bi koçbûna xwe dilê dê û bavê xwe xemgîn kirin.

Gîyanên Piçûk Koç Kirin



Hind Ebdelo

**Li mala Fîdanê heman
dîmena min di xew de
dîtibû li pêş çavên min
bû rastîyek...**

Çîrok

Odeyêke reş û vala, dengine bîyan
tê de vedengeke bi tirs didin û
derîyekî nîvkêşî, tê re ronahîne li vir û
li wir belvakirî derdikevin. Bi gavine
tirsok ji tirs ku çî li pişt wî derî ye hêdî
hêdî ji derî ve nêzîk bûm. Bi destê xwe
yê rastê min ew derî bi hindir ve vekir.

Hema derî vebû wan ronahîyan
di koşeyên odeya reş û vela de
xwe veşartin. Lê livliva lêvên wan
ronahîyan dîyar dikirin ku ew livliva
lêvên zarokine piçûk in, erê ev ronahîya
gîyanên zarokine piçûk bûn.

Da ku wan ji alîyê xwe ve hêmin
bikim û tirs wan ji min bi alîyekî ve
tê ve dim, min bi dengê xwe ştrana
zarokatîya xwe ştrand, ew ştrana ku

dema ez mezin bûm, êdî min ji zarokên
cîranan re diştrand.

Ez zarokek piçûk im

Ez zarokek xweşik im

Por dirêj û bejn kin im

Ji dê û bavê xwe hez dikim

Bi heval û dostên xwe re dilîzim

Bi kenê xwe jîyanê xweş dikim

Bi vê ştranê re ew gîyanên ronahîdar
ji koşeyên odeyê yek bi yek derdiketin,
hêdî hêdî her ku ew ronahî ji min ve
nêzîk dibûn teşeyên zarokan li wan bar
dibû. Ber bi min ve hatin, li dora min
xaleke gilover çêkirin û liştin. Di nav
wê xala gilover de min li rûyên wan
zarokan yek bi yek dinêrî. Ew zarok min
nas kirin, ew zarokên cîrana me Fîdanê

fireh dikelîne û diguvêşe lê ranaqelîne.

Êvarê Careke din li fen û fûtên Şado rast tê, qirikê li hev zuha dikin, dema nivîs û jiberkirina karê malê ye, yê ku dibistanê ji wan re destnîşan kirîye. Tev ku dêya Şado refa yazdan jî bi zimanê Erebi bidawî kirîye û civata ku li devê deriyê wê digere jê diqeherin, ew jî vê yekê dizane, lê ev zimanê xurû kurdî ku li dibistanan tê fêrkirin pê giran e, jê re bûye girêk û pirê caran Şado ji ber vê yekê dikare xwe ji ber karê malê bide alî.

Di destpêkê de pir aciz û teng dibû, carinan di ber xwe de nerazîbûna xwe diyar dikir, lê ger bavê Şado dengê wê dibihîst, wê çaxê xwedê jê stendibû û bê çare dima ku wê şevê ji hêla bavê Şado ve bikeve perwerdeyeke girtî derbarê welatparêzî û zimanperweriyê de.

Piştî salekê, bi zorê du astên ziman bidawî kirin, dikarîbû bi serbestî keç û kurê xwe fêrî waneyan bike û vê serkeftinê hiştibû ku qehr di dilê civata wê de şax bide.

- Sed carî min ji te re gotîye li zarokan nexe, te ev lawik şewitandîye bavo..! Ji sibê ta nîvroyê li dibistanê, hîn gepa nan ji devê wî nakeve tu berê wî ta êvarê didî gavantîyê, hema li çolê ye û bi dû qûna vê çêlekê de ye, êvarî pê de jî tu nahêlî ku serê xwe ji ser pirtûkê rake, rehmê lê bike, zarok e..! Bavê Şado bi zirzbûneke bêhawe ku cara yekê ye wisa li Samo hiltê axivî.

- Welle ez vê kêferatê hemî ji bo wî dikim, ma çend kurê me ne, ma

bila ew jî nexwende be..! Samo beşî û vegerand.

Şado û Nişmo piştî berevanîya bav, hundir serûbinî hev kirin, pê hev diketin, ji odeyekê ber bi ya dî ve baz didan. Çavê dêya wan ji tîrsa ku zirarekê bikin an tiştekî bişkînin bi wan ve mabû, ta ku bêhna bavê Şado hindekî fireh bike, du fincanên qehwê danî ser êgir.

Bazdana zarokan li hundir berdewam e, dengê kenê wan di dilê Samo de bilind dibe, kenê bavê wan û dûyê çixareya wî bi kêfxweşî bilindtir dibe û pê re kefa li ser devê cizwê qehwê jî bilind dibe.

Ta ku Samo kurê xwe Şado ji rijandina qehweya kelandî ya di destê wê de biparêze, bi lez piştî xwe dayê û xwe ji rêya wî da alî, Şado yê bilez jî hewl da ku xwe bide alî, lê li bin guhê dêya xwe û sifreya qehwê ket û bi dest û riwê xwe di beroşa şîrê kelandî de werbû.

Qêrîn bi Samo ket, ew û her kesê ku di erebeyê de veciniqîn, û çavê rêwîyan ew bi pîrsa şewitand. Samo tiştekî li xwe çênêkir û ziq li pêş xwe nêrî û ji nişkave got:

- Bes e, bes e, bes..! ez ghiştim, min ah li vir, li ber QARMA Serê Kanîyê dax.

Piştî ku daket, Samo nas kir ku rêya kampa Waşokanî derbas kirîye. Li ser buxçika êşa xwe rûnişt, berê xwe bi aliyê Serê Kanîyê ve kir û keserek kişand.

bi teşîya feqîrîyê rêsaye û bi tilîyên êşê hûnandîye.

Nemlî û qubaleyên Metbexa xwe vala kir û tûrikê nîsk, bixul, şekir û xwê derxiştin û binê wan paqij kir, careke dî vegerandin cihê wan. Têr li tûrikê bixulê nêrî, devê wî vekir, destê xwe di nav re bir û anî û mistek jê derxişt, libo libo weke ku merov li ber bayê payîzê bidêre vegerandin tûrik û zimanê wê bi gotinine ku nema tê bîra wê jî digerîya. Ev dîyarîya salane ya xeswa wê bû. xeswê jê re dikeland, çend rojan radixişt, hişk dikir, dişand êş, dihêra û para wê ta malê jê re dişand.

- Bi qasî libên vî danî qurban bûmê yadê Cemîla, bêhna destê te ji her derê tê. Samo di ber xwe de bi şewat got û dilopek şor ji çavên xwe qewirand.

Ber êvarê Şado çêlek ji çêra derdora kanîyên bajêr anîbû, bazarên rojane bi dêya xwe re dikir, wek her car ew şaşomaşo dikir û di hesab de matmayî dihişt û dikarîbû çend lêreyên zêde kirya gavantîya xwe ya rojane ji dêya ku dibû tîqetîqa kenê wê bideşt bixe.

Du çêlekên Samo berya niha miribûn, sedem jî - li gor wê-nebawerîya bavê Şado bi berbejnên ku çavan dûr dixin û merov biparêzin. Pevçûna wan ya tekane her dem li ser vê yekê bû. Her dem wî hevîna xwe dianî ser rê û bi nerîna xwe razî dikir, lê her dem jî piştî danuştendineke dudirêj dêya Şado di ber xwe de bi dengekî nizimm digot:

- Welle ez dibêjim mirina wan ji ber berbejnan e, îca bila weke te be..!

Mastê mala bavê Şado di nav bajêr de ji xwarngêha Sîrup jî navdartir bûbû, kesê ku dixwest satilekê bideşt bixe, divabû berîya wê bi rojekê wan haydar bike ta ku misoger bike.

Samo dawa xwe li bejna ku bavê Şado ta niha ketîyê qelenê wê ye gernad, êmê çêlekê danî ber û hêdî hêdî dest bi dotinê kir.


- Raşt e gemar û westana dewaran heye, lê xêra wan pirtir e. di ber dotina xwe re ji xwe re digot.

Ro li ber ava ye, êvarên buharê sar in, lê sermayeke xweş e, mirov dixwaze her dem hilmeke kûr jê bikişîne hinavên xwe. Çîrokên Gula xeydokî, Leylîya kurdûnde, Ferîda bî û Şêrîna pitpitokî rê li ber derîyê Samo nadin hev. Berhemên mîna şîrîzerk, tolik, qinêber û kereng ku ji vê sibehê de ji çolê dane hev ji nav hev derdixin û paqij dikin, lê tiştine ji vê paqijkirinê girintir hene; jihevderxiştina çîrokên taxê - yên ku dawîya wan nayê - ji serê kolanê ta dawîya wê ne. Gelek caran civatê sînor derbas dikir û kolanek dido jî dizivirand. Mijar germ dibûn û carinan civat bi xwe ji bo raştî û neraştîya hindek nûçe ji hev dixeydî. Samo her dem guhdar bû, ger weke her car di navbera gulê û Şêrînê de gur dibû, ew bi rola navgînîyê radibû, bi hindek pesindan ji bo ya bibinketî pîrsgirêk çareser dikir û civat bidawî dikir.

Para Dêya Şado ji wî pincarî misoger e, ji bo firavîna sibe bêhan

Rê

**Piştî ku daket, Samo nas kir ku
rêya kampa Waşokanî derbas
kirîye. Li ser buxçika êşa xwe
rûnişt, berê xwe bi aliyê Serê
Kanîyê ve kir û keserek kişand.**



Qadir Egîd

Ji bajarê Heseke ber bi mala xwe ya nû ve diçe, buxçikek rengîn ku ji êşa wê girantir e di hembêza wê de ye. Serê wê dixele, her car bi ser ya kêleka xwe de tê xwarê, çeng dibe, çavên weştyayî dikutkutîne, tişteki li xwe çênake, bi kubarî ziq li pêş xwe dinêre û dûlabên erebeyê rûyê rêya qîrkişî dialêse.

Şeva borî Samo ta destê sibehê

mîna zîzokê bi karê malê mijûl bû, tej û berên malê hemû derxiştibûn, şuştin û li ser dîwarê hezkirinê di navbera xwe û cîrana xwe Hesîna de raxiştin. Dilopên ku ji wan dadiwerivîn, diçirisîn, hino hino gulên di ber dîwar de li ser rêzekê çandine av didan, rokê li tejikan dida û keldûmana tirsê ji wan difûrîya. Li ber dilê wê hezkirîyê herî delalî ne, her peng û gîlokeke tayê wê



■ Pakrewanên Şanoya Kurdistanê

pêwîst e di fikir afirandin û biryar standinê de jî bi hev re kar bikin. Ev taybetmendî hemû di heman demê de divê di şoreşgeran de jî hebe. Şoreşger, kedkar û şanoger xisletên kesayetî ne ku hevdu pir baş temam dikin. Ev jî bo hemû hunermendan jî derbasdar e.

Em şanogerên şoreşger şanoyê tenê weke derketina sehnê û lîstikvanîyê nikarin bigirin dest. Em nikarin hunerê teng bigirin dest û wekî karekî şexsî nêzî wê bibin. Şano çand e, bîrdozî ye. Şano civakî ye û xebatekî şoreşgerî ye. Divê em bi vê zanebûnê tevbigerin. Ji bo em li dijî modernîteya kapîtalîst modernîteya demokratîk ava bikin, ihtîyacê me bi xebatên hunerî yên ku bi sedan mirov di nav de ne heye. Ji bo wê jî felsefe û rêxistinbûn pêwîst e. ihtîyacê me bi rêxistinbûneke çandî- bîrdozî ya bi vî şêwazî heye. Em bawer dikin ku, hunê li Rojava vê rêxistinbûnê ava bikin. Serkeftina konferansa me wê ew be. Perwerde,

rêxistinbûn û pratîk ji bo me jênegar in. Bêguman bi rastî anîna ziman ve rastî pêk nayê. Ji bo pêkhatina rastîyê, divê mirov xwe bike hêza çareserîyê, pêwîst e mirov çareserîyê di xwe de biafirîne. Ew hegemonîya serdest a ku di qada hunerê de hatîye damezirandin divê were derbaskirin, ji bo wê jî divê mirov bibe xebatkarekî cidî û jidil yê rêxistineke cidî ya hunerê.

Li ser bingehe biryardariya me ya pêkanîna berpirsariyê û erkên xwe yên şoreşgerî, di serî de em soz didin Ş.Yekta, Ş.Hêvî, Ş.Daxistan, Ş.Sarya, Ş.Baran, Ş.Rêzan, dîsa Ş.Welat, Ş.Şervan, Ş.Osman û Ş.Merwan ku demên dawî de di şoreşa azadîyê ya Rojava de şehîd ketibûn, dîsa di şexsê van hevalan de em soz didin hemû şehîdên têkoşîna azadîyê ku em ê her tim girêdayî wan bimînin. Bîranîna şehîdên me wê her tim rêya têkoşîna me ya çand û hunera şoreşgerî ronî bike.

divê di her firsatê de xebatên xwe nîşanî herkesî bikin, nêrîn û rexnên wan bigirin û ji bo hêj baştir bibe em bixebitin.

Mijareke girîng jî akademî û dibistan in. Em ji gotina akademîyê çî fêm dikin, Em ji nîqaşê çî fêm dikin? Nîqaşkirin zelalbûn e. Di akademîyan de nîqaş pêşxistin, di mirov de kadrobûyîne û karzanîyê ava dike. Êdî berpirsariyê rakirin e. Ji jîyana kapîtalîst û modernîst qutbûn e. Bêyî ku serî li zordestîyê û şidetê bidî, însan îqnakirin û civakeke nû avakirin e, însakirin e. Ji bo civak ava bibe, divê di serî de însan ava bibe; ji ber ku civak ji mirovan pêk tê. Kesayet û nasnameya mirovan çawa tê çêkirin, heştên mirovan çawa têne perwerdekirin? Huner û wêje, bi taybetî jî şano di avakirina civakê de hêzeke girîng e. Pêwîst e em vê hêzê hêj baştir bişixulînin. Ji bo wê jî em behsa zihnîyetê dikin. Zihnîyeta bibandor însaya bibandor e. Zihnîyet lawaz be em nikarin baş ava bikin. Mînak, yên di akademî û dibistanên me de dixwînin, digihêjin pêwîst e xwedî pîvan bin; divê ji van akademîyan mirovên firotinê, hunera firotinê dernekeve! Pêwîst e pîvana me zelal û net be. Taybetî divê pere qet nekeve nav şanoyê de. Ji ber ku bihayê mirov tune. Akademî û dibistanên me pêwîst e kadroyên pêşeng çêkin. Navê akademî, dergê, medrese, ocax zêde ne girîng e. Ya girîng naveroka wê ye, ya girîng rêxistinî, însakirin e. Yanî ev, bi hêza rêxistinî mudaxelekirina pîrsgirêkan e, çareserkirin e û

encamgirtin e. Akademî haveynê civakê ye. Mejîyê mirov e. Pêkanîna bizanebûn e. Divê em xebatên çand, huner û şanoyê fêm bikin û welê pêk bînin. Heger em baş fêm nekin, em nikarin pêk bînin.

Qurs û waneyên şanoyê jî mijarên girîng in. Kesên ku meyla wan ji şanoyê re heye, berîya ku em wan bigirin nav komên xwe, sazîyên xwe, em wan perwerde bikin. Piştî ku me di wan de astek ava kir û şûnde em wan pêş bêxin. Divê qursên me yên ji bo zarokan û mezinan her tim hebe. Şano hunereke fêrker e. Mirovê ku bibe şanoger xwe û civaka xwe baştir nas dike. Ji ber ku şano xwe dispêre çavderîyê û guhertinê. Di guhertina karakter de tevkarîya wê heye. Li beramberî pîrsgirêkên civakê, di mirov de hesasbûn û heştîyarîyê ava dike. Dîsa, şewazê xebatê wê di mirov de taybetmendîyên berpirsariyê, piştevanîyê, jîyana komînal, jixwebawerîyê, di mijarên xwe îfadekirinê de mirov pêş dixê. Şanoger xweş diaxivin, mirov dibe xwedî pîvan. Lêhûrbûyîna şanogêran her tim pir xurt e. Liv û tevgerîna me hem pêş dixê, hem jî otokontrolê ava dike. Cîhana mirov a xeyalî pêş dixê, xuliqarîyê û azadîyê di wî de pêş ava dike. Yên ku bi şanoyê re mijûl dibin, mereqdar, biştîqrar, hesas, lêkolîner dibin. Ew mirovên kedkar in, sehna xwe, dekora xwe, kostûmê xwe ew bi xwe çêdike. Em ji bîr nekin ku, lêhûrbûyîn, fikirîn, serêşandin jî kedê dixwaze. Wekî bi hev re karkirinê,



■ Şanoya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê

ji devreyê hegemonya hunerî ya navendî dimîne, bi mijara me ve girêdayî şanoya şoreşgerî, di avakirina pergala Modernîteya Demokratîk de hêzeke pêşeng û çalak e. Ev pergala demokratîk wê li ser esasê hevgirtî, dostanî û xwişk û biratîya gelên Rojhilata Navîn û Kurdistanê ava bibe. Di vê pergala demokratîk de erkên pir girîng li benda hunermendên şanoger in. Şanoya ku di feraseta şiyarbûna gel û vegera cewher de, hem di perwerdekirina gel de, hem jî di avakirina yekîtîya gelan de xwedî girîngîyeke jêneger e. Rêxistinên hunera demokratîk, komên şanoyê yên şoreşger heger di vê çarçoveyê de werin avakirin, hingê dikarin hunera ku di destê kapîtalîzmê de ketîye ber sekeratê, rizgar bikin. Ji bo şanoger bikaribin van peywir û berpirsyariyan pêk bînin, pêwîst e hem xwe hem jî gel baş perwerde bikin. Hem divê em

bi xwe perwerdeyên bîrdozî û hunerî bidin-çêkin, hem jî divê em xwe tevî perwerdeyên rêxistinî yên giştî bikin. Divê armancên me yên vekirina Dîbîstana Şanoyê, konservatûar, akademîya hebin. Divê em li ser huner û şanoyê kovar an jî amûrên perwerdekirinê yên cuda amade bikin. Pêwîst e bi semîneran, bi xebatên atolye û bi nîqaşan em ihtiyacê perwerdeyê pêk bînin. Di heman demê de divê em pratîk jî bikin; herî zêde divê em lîstokên ku çanda me îfade bike û pêş bêxe bilîzin. Divê em di senaryoyên xwe de nîrxên xwe yên têkoşîna azadîya Kurd bînin ziman û bineqîşînin. Pêwîst e em şoreşa Rojava bi zimanekî hunerî vebêjin. Divê em xebatên têkildarî zarokan, jinan, ciwanan çêbikin. Her der ji bo me sehne ye, divê li her derê em xwe bigihînin gel. Em dikarin van xebatan ji bo TV û Radyonan jî çêkin. Em

Çavkanîya huner û şanoya Kurdî li ku derê ye em bibînin, mîtolojîya wê çi ye em fêr bibin, rîtûelê wê çîye em bizanin! Em dewlemendiya wêjeya me ya devkî derbasî şanoyê bikin. Em şanoya ku li gundan, li çîya û bajaran hatiye çêkirin lêkolîn bikin, em ê hingê bibînin ku çanda me pir dewlemend e. Em lîstokan bixwînin, binivîsin, bilîzin, pêşandina wan bikin... Em li vê nîvenga newekhev de şanoya Kurdî ji rewşa wê ya dezavantaj derxînin, wê bigihînin cihê ku heq dike û wê bi serkeftinan tacîdar bikin. Şanoya Kurdî xweyê raborîyekê ye, hem di dîrokê de hem jî di raborîya nêz de mînakên wê pir in; Kosegelî, Bûkabaranê û... hwd. Bêhêjmar lîstokên me yên gundan ên kevin hene. Dîsa dengbêjên me, çîrok, çîvanok û çîrokbêjên me hene. Demên nêz de jî, tevî hemû pêkanînen qirkirinê, feraseta înkarker, qedexeker jî şanoya Kurdî xwe afirandiye. Dawîya salên 80'î û salên 90'î şano hemû dihatin qirkirin û kuştin. Lê belê şanoya Kurdî bi saya derketina Tevgera Azadiyê, bi awayekî lez pêş diket. Li Rojava çanda şano, çanda komê xweyê daneheveke cidî ye. Dîsa salên 90'î, wan demên ku PKK'ê xwe bi awayekî xurt digihand girseyên gel, tevî girtin, binçavkirin û zordestiyê jî li Bakûr qederekê pêşketiye. Li enîstîtûya Kurdî û li sazîyên me yên din ên çandî de, bi nêzî 100 lîstokan tevgerîneke mezin hatiye bidestxistin. 'Teatra Jîyana Nû' komeke girîng a wê demê ye. Pir lîstikvanên şanoyê ku di wê komê de gihîştibûn û pêşketibûn, îro di sazîyên me yên Kurdistanê de kar dikin. Roja

me ya îro hem li Rojava, hem li Bakur hem jî li perçên din ên Kurdistanê şanogerên jîr û xwedîyê potansîyelekî xurt pir in. Lê belê em dixwazin balê bikşînin ser mijareke girîng. Şanoya Kurdî îro bi rewşeke weke ya Îranê û Tirkîyê ya salên 70'î re rûbirû ye. Xeter e û rîska popûlertiyê, mehkûmbûna desthilatdariyê û çîna navîn heye. Xeterîya elîtîzmê, metabûyîn-malbûyîn û ketina rewşeke ya şahî-nî (jirêzêbûn) heye. Qadên herî girîng ên ku vê rewşê seraşt bikin û şanoya me li ser xetek şoreşger û gelparêz bidin meşandin qadên Rojava û Bakur in. Çi di sazîyên çandî yên Kurdî de, çi di cihekî din de, li ku derê be bila bibe popûlertî, elîtmayîn (li jor de mayîn) ji gel dûr ketin, huner firotin tiştên pir xeter in. Em qet nebêjin şanoya Kurdî bi xetereyêke wiha re rûbirû namîne. Feraseteke hunerî ya ji çanda Kurd a şoreşgerî dûr, encameke wiha ava dike. Hunera ku bi feraseta dewletê were çêkirin wê vê ava bike. Başûr mînaka herî girîng e di destê me de. Bi zimanê Kurdî bê çêkirin jî, şanoyêke ku em jê re bêjin şanoya Kurdî li naverastê nîn e. Berovajî wê, pratîka ku pêş têxe li dijî Tevgera Çanda Demokratîk e. Ji çand û hunera demokratîk û jî şanoya gel dûr e. Xebatên wê derê temamî pişta xwe daye pera, popûlîzmê û nêzîkbûnên paşverû û yên... hwd. Ya ku wê derê sereraşt bike dîsa hunera me ya şoreşger û gelparêz e.

Ya rast çi be divê em wê bikin. Gel wê jî me hêvî dike. Ya li me bide qezençkirin jî ew e; a rast e.

Hunera şoreşgerî û gelparêz ku

Lê em înşa dikin, ji nû ve çêdikin. Divê her kes bizanibe ku ji nû ve çêkirin, avakirin a herî zor û zehmet e. Şkandin, belavkirin, xerakirin hêsan e; çêkirin, yekkirin, pêkanîn zor e. em nekevin pey a hêsan û rehet, karên zehmet li pêşîya me ne. Divê em wan karên zor û zehmet bi serxin. Çand û huner karekî zor e. kesayetên xurt, bihêz dixwaze. Bi kesayeta lawaz ketina nava van karan zerer dide. Heta tehrîbatên ku ew çêdikin, pir zehmet têne dermankirin. Ji bona wê jî, di xwe de kesayet avakirin pir girîng e. Kesayeta Rêbertîyê, kesayeta PKK'ê, kesayeta şoreşgerî mijarên ku herî zêde divê em li ser bisekinin. Huner jî karê kesayet avakirinê ye. Heger em dixwazin bibin hunermend, kesayeta PKK'ê, kesayeta Apogerî, mirovê azad kî ye, divê em ji xwe bipirsin. Şanoya jîyana azad encax bi mirovên azad pêk tê. Em jibîr nekin ku em çiqas azad bibin, em ewqas dikarin azad bikin.

Şanoya Kurd pratîkkirinê û pêkanînê dixwaze. Gotina 'divê em çêkin!' girîng e. Lê ya ji wê jî girîngtir 'çêkirin e.' Divê tenê di gotinê de nemîne, divê pêk bê. Lawaz jî be, xurt jî be divê em şanoyê çêkin, ku em xwe bibînin; Em çiqas dikarin çêkin, ya baştir em dikarin çawa çêkin?

Ew pergala ku em dixwazin di civaka nû de çêbibe, pêk were, em dikarin di şanoyê de damezirînin û bidin jîyandin. Heta em dikarin vê bi rêya şanoyê ji civakê re jî vebêjin. Di wê civakîbûna ku em ê damezirînin de pîvan, liv û tevgerên ku em dixwazin

esas bêne girtin çî be, bi rêya şanoyê em dikarin pêk bînin. Heger roja me ya îro şanoya gel bikaribe bi çanda kevneşop re têkilîyekî xurt çêbike û danehevên şoreşên cîhanê baş fêm bike, hingê li Rojhilata Navîn û li Kurdiştanê rewşa şanoyê wê pir cuda be. Nirxên azadiyê û şoreşgeriyê bi dîrokê re, bi felsefê re, bi azadiya jinê re têkilîyeke xurt çêbike, hingê xeta şanoya jîyana azad wê xwe qayîm bike. Niha tam dema wê ye. Hê jî ne dereng e! Bi vê çandîbûna nû, em dikarin tevkarîyeke xurt ji bo mirovatîyê bikin. Ew şanoya ku xwe bispêre şoreşa Rojava û pêşbikeve, bêguman bi awayekî hêj watedartir, dikare li ser navê şanoya Kurd xwe tevî gerdûnîyê bike. Şanoya ku cewherê wê xurt di demokratîkbûna Rojhilata Navîn de jî dikare roleke girîng bilîze. Rojavaya azad jî, hem ji aliyê Kurdan ve, hem jî ji aliyê gelên cuda ve xwedîyê çarçoveyeke dewlemend e. Bi hêza nîrxên gelan wê xwe hêj xurtir bike. Li Rojava potansîyeleke dewlemend û hêzeke mezin a mirovan jî heye. Tiştê ji wir re pêwîst, li ser esasê perspektîfeke rast karkirin e. Nîrxên komînal û çandî yên Rojhilata Navîn û Kurdiştanê, li benda alîkarîya me ne.

Heger, em şanoya Kurd ji aliyê 'dîroka nêz' a Erebi, Tirk û Farsan bigirin dest, dibe ku weke nivîskî me repertuarekî wekî ya wan dewlemend tune be. Lê weke potansîyel (hêza veşarî) em ne xizan in jî. Heta hêj dewlemendtir e jî. Çand, huner, estetîk çî ye? Em vana baş nîqaş bikin.

ve şano civaka li ser sehnê yan jî dikê ye. Divê em wê şanoya weke civakeke piçûk veguherînin çalakgerîya azadî, wekhevî û demokrasîyê. Zimanê şanoya civaka demokratîk her tim sîyasî ye. Ji ber ku sîyaset karê civakê ye, tu kes nikare ji sîyasetê dûr bimîne. Şanogerên me divê civakparêz û gelparêz bin. Şano jî wekî şanoger ji civakê qut nayê destgirtin. Şanoya civakî, bêyî ku civakê biparêze nikare sîyasetê bike. Her tiştê ku civakî ye, di heman demê de sîyasî ye jî. Lê belê îro di şanoyê de pîrsgirêka sîyasetê derketîye. Ji ber ku mixabin şano ji gel dûr ketîye. Ji bo derbaskirina vê pîrsgirêkê, pêwîst e em pîr nîqaş bikin, em bibin xwedîyê pratîkeke rast û xwe bigihînin gel. Ev qibla me ye. Dema em lîstokeke şanoyê amade bikin, divê em bipirsin, çend caran hatîye lîstin. Çend kesan temaşe kirîye, xwe gihandîye çend kesan, çi daye wan - çi standîye? Divê em muhesebeya wê baş bikin. Pêwîst e tu lîstoka me bê encam nemîne, divê em encamê jê bigirin. Girêdayî vê mijareke din jî ev e; divê em rêxistinî bin. Divê rêveberîyeke me ya baş hebe. Mamosteyên me, nivîskarên me, derhênerên me, her tiştên me pêwîst e hebe. Heger nebe divê em çêbikin, biafirînin. Kêm be divê em pêşxin û mezin bikin. Li Rojava şoreşeke mezin tê jîyîn, pêwîst e şanoya vê şoreşê jî mezin be û layiqî vê şoreşê be. Mînak: Di nava salekê de em ê çend koman damezirînin, çend lîstokan bilîzin. Em ê kîjan mijaran bigirin dest û di kîjan mijaran

de senaryo binivîsînin. Em berpirsyar in ku li dijî modernîteya kapîtalîst, jîyana demokratîk rêxistin bikin. Em hunermend, taybetî jî şanoger, dikarin di avakirina jîyana azad de bibin hêza herî çalak a bingeîn.

Ji bo vê jî di hunerê de û bi taybetî jî di şanoyê de, li dijî nêzîkatîyên serdest û mêtînger û feraseta desteserkirinê, em dikarin jîyaneke azad û şanoyeke şoreşger pêş bixin. Çawa ku karê şoreşgeran şoreş afirandin be, şanogerên şoreşger jî huner û şanoya şoreşgerî çêdikin. Li cîhanê şerê hunerê neqedîyaye. Şerê hunerê şerê bîrdozî û yê çandî ye. Leşkerê her şerî heye. Leşkerê şerên çandî jî hene. Rêber Apo her tim dibêje 'pêwîst e şer bi şewaza hunerê bê kirin'. Belkî jî di şerê vê gavê em dikin de, milê herî kêm dimîne milê wê yê afirînerîyê ye. Tê wê wateyê ku milê me yê hunerî, xuliqkarîya me, çalakîyên me yên xweşik û bi bandor di tevahîya Kurdistanê de kêm in. Li Rojava jî ev heye û wê hê jî pêş bikeve. Şoreşa Rojava wê bi hunera xwe jî ispat bike ku ew şoreşa Kurdistanê ye. Wê di warê muzîk, şano, sînema, wêje, wênesazîyê û di hemû qadan de xwe ispat bike.

Em behsa şerekî yê bîrdozîyê dikin. Ev şer herî zêde jî di qada çand û hunerê de tê meşandin. Lê mixabin qada ku herî zêde em tê de lewaz in jî qada çand û hunerê ye. Li dijî bêçandîyê şerê çandê dayîn pîr zor e; Dijmin bêçandîyê li ser me ferz dike, çanda Kurd, çanda civakê belav dike.

çarçoveya me behskirî de wî karê xwe bike, hingê ew hunermend e. Kêsen ku pêşengtiyê nake, ji rêzê ye, ji yên ne civakî re em nabêjin hunermend. Hunermendî pîroz e. ji bo wê, ji yên ku karên pîroz neke hunermend nayê gotin. Heger hunermendê şanoyê 'çanda xwe, hebûna xwe û zanebûna xwe ya cewherî' ji xwe re weke bingeh û çavkanî nagire û hunera xwe li ser van esasan pêşnaxe, tê wê wateyê ku eslê jîyana wî xera bûye û êdî ew jîyan ne ayîdê wî ye. Êdî li xwe bûye bîyanî. Heger dil û mejîyê hunermend bi heşt û fikrên bîyanî, ne ayîdî wî û ne cewherî hatibin dagirtin, yanî dil û mejîyê wî ne ayîdê wî be, ne ayîdê civakê be, pêwişt e hingê em nîqaş bikin, gelo kar û çalakîya dike ji alîyê exlaqî ve erênî ye yan ne erênî ye. Ew kesê ku xwedîyê fikrekî ezez çawa dikare karekî civakî û pîroz bike, tişteki welê ne pêkan e.

Heger zihnîyeta civakeke belavbûyî be, tê wê wateyê ku mirovên wê civakê di alozî û krîzê de ne. Derketina ji krîzê jî tenê bi şoreşa zihnî û wijdanî pêkan e. îro weke hemû hunermendan, şanoger jî vê alozîyê dijîn. Ev di cewherê xwe de krîza zihnîyetê ye. Heger îro li Kurdistanê bihezaran şanogerên me, namzetên şanogerîyê, şagirtên me, bi sedan komên me û leyîstokên me nîn be, tê wateya ku pirsgirêk di ruh de ye û di watedayînê de ye. Pir dîyar e ku di wateya çandî de alozîyeke kûr tê jîyîn. Ev krîza ronakbûyînê ya ku di hemû qadên civakê de tê jîyîn, wekî

di hemû qadan de, di qada şanoyê de jî encax bi pêşxistina şoreşeke di kesayet û zihnîyetê mirov dikare wê derbas bike. Bi hilberîna ku ev şoreş di warê çawanî û çendahî (wesf û kemîyet) de bide çêkirin, wê di jîyana demokratîk û azad de şopeke (metod-azîne) nû veke. ji bo wê jî, ji bo şano û şanoger xwe ji nû ve ava bike, ji nû ve damezirîne û ji vê rewşa heyî derkeve, ihtîyaç bi cih û mekanên ku bikaribe mirov û şanoyê nîqaş bike heye. Bi qasî av û nan ihtîyacê me di gund û taxan de bi komên şanoyê, dergeh, mekteb û bi akademîyên şanoyê heye.

Encax bi vî awayî em dikarin li Kurdistanê şanoyê rêxistin bikin û pêş bixin. ji bona wê jî, pêwişt e li ser bingehê rast em şanoya Kurdî nîqaş bikin. Heger îro, di serî de li Bakurê Kurdistanê û li gelek cihan şanoya me ewqas ji civakê û ji têkoşîna azadîyê dûr mayî be, heta cih cih gihiştîbe xwedîyê nêrandinekî şaş, sedemên wê ev e. Em van nîqaş bikin, em bipirsin çima wiha ye? Di wateya leşkerî û sîyasî de em encam digirin, lê çima di qada çand û hunerê de em encameke têrker bi dest naxin. heta carnê em zererê didin. Divê em bikaribin van xalan nîqaş bikin. Şaşıyên leşkerî û sîyasî têne derbaskirin, têne telifikirin, lê em bizanibin ku şaşıyên çandî şaşıyên bîrdozî ne; em di îdeolojîyê de winda bikin, em nikarin telifî bikin.

Welatê me Kurdistan, ji bo şanoya şoreşgerî sehneyeke mezin û baş e. Şano di sehnê de civakeke piçûk çêdike û jîyanê dide der. Bi vê wateyê

Li Ser Xeta Şanoyê Me

**Heger roja me ya îro şanoya
gel bikaribe bi Nirxên azadiyê
û şoreşgeriyê bi dîrokê re, bi
felsefê re, bi azadiya jinê re
têkilîyeke xurt çêbike, hingê
xeta şanoya jîyana azad wê xwe
qayîm bike**



Ekîn Ronî

Huner

Hunera şanoyê bi kîjan çand û felsefeyê tê çêkirin û tê pêşxistin, ew ji bo Tevgera Azadiyê pir girîng e. Ji ber ku çand û felsefe awayê hebûyîna civakî ye û awayê îfadeya şewazê jîyanê ye.

Mîna hemû huneran şano jî ji bo me bi awayekî yekpare, cîhana wateyê û çandê dide der. Bi îfadeya dana der ve jî kêr dimîne, li cem wê

jî, huner diguhere, mayînde dike û wateyên nû diafirîne. Hunermend di her berhema xwe ya hunerî de, ya rast, awayê wê jîyana ku dixwaze ava bike dide der û dide jîyandin. Hunermend bi wateyeke din, danehev û lêhûrbûna ku çanda civakî di wî de ava kirîye, dîsa li civakê dizîvirîne-vediguhezîne û ji civakê re pêşengtîyê dike. Kesê ku şanogerîyê dike şanoger e, lê belê di

-Me – ke..

-Me – me..!

-Were em hinekî ji xwe ra bifikirin.

-Were.

-Dêmek wisa... Tu dikarî ji min ra çayê tevî lîmonê bînî?

-Dikarim.

-Lê wekî çayê bînî, lîmonê nexî nav, dikarî?.. Tenê lez nekeve, pak bide mitala.

-Na. Nikarim.

-Bona çi!!?

-Heval, tu fêhm nakî, me civîna xwe derbas kir û ser civînê talîmet hat standin, wekî ayê tenê tevî lîmonê bidin mîlet...

-Tu rûnê, rûnê... Ber xwe nekeve. Were em dîsa bifikirin.

-Were.

-Dêmek wisa; çayê heye?

-Belê.

-Lîmon jî heye?

-Erê.

-Dêmek; ji bo wê yekê, wekî tu ji min ra çayê bê lîmon bînî... Tu lez nekeve... Lez nekeve... Gerek tu lîmonê nekî nav!.. Xu dibe!..

-Na! Nabe.

-Bona çi nabe?

-Di civînê de qîrar wisa hatîye standin.

-Ezîza min... Delala min..

-Ez ne ezîza te me û ne jî delala te me... Em hevalin.

Pak, pak... Hinekî hişê xwe topî ser hev bike... Tiştê wisa naqewime. Heger çayê heye û lîmon jî heye – bi teorêtîk – çayê tevî lîmonê jî dibe, çayê bê lîmon jî dibe û lîmon jî bê çayê dibe. Xu wisa ye..., delala min... Xu wisa ye, hevala min...

-Na. Ne wisa ye... Talîmat hatîye; gerek çayê tenê tevî lîmonê be.

-Bîna xwe fireke... Tu jî xwe biceribîne. Here, îstekana çayê dagire, lê lîmonê nexê nav... Ew lap hêsaye... Xwe biceribîne... De here, hevala min, de here...

Ew diçe û bi zûtîrekê bê çayê tê...

-Dibînî – dinê de her tişt çawa hêsan e, heger meriv bixwaze?... Dibînî çawa baş e... Ay ev çayê bê lîmone....

-(Lîmoneke terikî dike nav çaya wî) Lê ev çayê tevî lîmonê ye...

Devê mêrik bi matmayî vekirî dimîne..

Çayê Tev Lîmonê



Grîgorîy Gorîn
Wergera ji Rûsî: Şalîko Bêkes



werger

-Roj baş, heval...
-Roj baş...
-Çawa yî, Baş î?
-Ber rehma Xwedê me.
-Heval, tu yê çi vexwyî...
Çayê, qehwê?
-Qehwe.
-Qehwe tune.
-De, wekî wisane, çayê.

-Tevî lîmonê?
-Na, bê lîmon.
-Bê lîmon , tune.
-Çawa tune, Lê tevî lîmonê
heye?
-Tevî lîmonê heye.
-Wekî wisa ye, çira bê
lîmon tune?
-Me wisa qirar kir ye.

Navê Pirtûkê: **Xeyalên Koçber**

Nivîskar: Hezar Nerexî


Naverok: (Roman)

Nivîskar balê dikşîne ser di axa welatê xwe de bûyîna penabertîyê. Penabertî her çiqas dûrbûna ji welat bîne bîra mirov jî, lê di raştîya mexmûrê de, welatek hate avakirin. Welat bi xwe re bar kirin û xîstîna tûrikê xwe, ev bû tovê jîyaneke nû û navê wê nehatiye jibîrkirin.

Nivîskar li pey Xeyalên Koçber ên gelekî diket. Bi wan xeyalan re, di nav kontarên çîyayê Cûdî de pêlekî serhildanê ji nû ve deşt pê fikir û pêl bi pêl li gelî û zozanan belav dibû, li sertapên Cûdî û Gabarê dibû qêrîna azadiyê.

Hijmara Rûpelan: 442

Weşanxaneyê Şilêr – Qamişlo/ 2019



Navê Pirtûkê: **Henasên jîyanê “Koçberîya bê henas”**

Nivîskar: Narîn Omer Seyfedîn


Naverok: (Roman)

Koçberîya bê henas bê rêdan û bê deng derbasî henaseyên me bû, şîrava pispisa evînî û aramîyê mijand û bê daqurtandin ew tevî jehra penaberî û mişextîyê werkir, em jîndar bi tevahî yên canxweş û yên bêcan li kelek û gemîyên bîyanîya nenas serrast kirin û em kirin dilên lepên derya û dariştanan mîna kerwanê bê şivan û semyan. Doza Jinê bi xurtî amade ye bi xweşî û nexweşîyên xwe ve.

Ev Roman mijara koçberîyê tevî çend çîrokên civakî û gelêrî û kesayetî dike li ser ziman û ramanên lehenga romanê û kesên din bi çend tabloyên wêjeyî û hunerî û cinavî.

Hejmara Rûpelan: 164

Cih û Dîroka weşandin: Çapxaneyê Sesera, Berlîn, Elmanya -Çapa yekem 2019



Pirtûkên derketî

Navê Pirtûkê: **Penageh**


Nivîskar: Merwan Berekat

Naverok: (Roman)

Naveroka romanê rewşa penaberên Sûrîyê yê di penageheke ku li Tirkîyê hatîye avakirin dide ber çavan. Di wê pengehê de sê keç û kelmêrekî Kurd jî hene. Hersê keç nemaze ji alîyê kargêrîya penagehê ve raştî gelek bûyer, çîrok û êşan tên. Li dawîyê bi alîkarîya wî kalemêrî û xortekî ji Bakurê Kurdistanê ji penagehê rizgar dibin û diçin Kobanîyê gundê Şeşê.

Hejmara Rûpelan: 152

weşanxaneya AVA- navenda Kobanê / 2020



Navê Pirtûkê: **Çirrik**

Nivîskar: Nêrgiz Ismayîl

Naverok: (Roman)

Romana Çirrik ku di nava xwe da çîroka rêwîtiya ser xet û binxetê dihûne. Di dilê Gulnazê de bi dehan hesret, êş, jan û rêwîtiyên ku bi xwe re erdnîgarîyan nasnake heye. Bêhna warê Omerîyan xwe berdide deşta Mêrdînîyan ku qet sînor nasnekirîye dike. Di her dûmenekî de şoreşeke serhildêr hatîye vegotin. Bêrîya Mêrdînê zarokên xwe ji bîr nekir. Bi zimanê xwerû kurmancîya bêrîya Mêrdînê hatîye vegotin. Bedewîya kulîlkên fîstanê Gulnazê rêwîtiyên welatê rojê rengîn dike. Çirrik a bîra jîyanê bû, bi xwe re dewr û dema şoreşê jî vedibêje.

Hejmara Rûpelan: 288

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ Adara 2019



bandora xwe de hiştîye.

Em ê di vê nivîsara xwe de li ser nivîskarê mezin ê Îtalî Italo Calvîno û berhema wî ya bi navê "Heger Rêwîyek di Şevê Zivîstanê de" raweştin.

Italo Calvîno li ser "xwîner" a pir fikirî ye û nivîskarekî mezin û baş e. Wî dixwest ku xwîner wî bi berhemên wî nas bikin û wisa bimînin. Ji derveyî berhemên xwe nedixwest ku bê naskirin. Nirxkarê Fransevî Paûl Fôûrnel, ji bo Calvîno "mirovê herî kêr di xavê" lê belê xwe bi berhemên xwe baş dikare bide nas kirin.

Kurtasiya Romanê:



Nivîskar di destpêka romanê de jin û mêrekî ji xwîneran re rave dike. Di romanê de her tişt ev herdu kesên ku hay ji hevdu tune ne dest pê dike. Pirtûka ku ev jin û mêr dixwînin hinek rûpelên xwe kêr in. Herdu lehengên me dest pê rêwîtiyekê dikin û diçin cem pirtûkfiroş. Dawîyê sohbetekê dest pê dike û ev sohbetê vedigere ser wêjeyê. Li cem pirtûkfiroş jî li ser wê romanê dipeyivin û ji hev vediqetin. Di wê navberê de hin tiştên din diqewimin, jin û mêr diçin cem profesorekî ku li zanîngehê dixebite. Profesor di derheqê wê romanê de ji wan re gelek tiştan dibêje. Xwînerê mêr dikeve pey şopandina wê pirtûka ku kêr e. Digere digere û dîsa tê ser rêya xwe ya serî. Di nava wê vegerê de tiştêk tê bîra mirov; ev gera ku lehengê mêr dike gera destxistina rûpelên kêr

in an gera heqîqetê ye?

Nivîskar di destpêka romanê de bi awayekî zelal bi xwînerên xwe re di xavê û çawa ew roman nivîsandîyê, ev roman çawa derketîye holê û ew ê xwîner di rewşêke çawa de bixwîne bi kurtasî ji me re dibêje. Ev tişt jî li ber çavan e ku nivîskar dixwaze xwîner jî tevî metnê bibe û keda xwe birêje. Bila xwîner jî li ser romanê bifikire. Bi ya min armanca nivîskar tiştêkî cuda ye. Nivîskar dibêje gelo ez dikarim metnekê ji der metnê ji rêzê binivîsim an na. Gelo ez dikarim metneke wisa binivîsim ku yên bixwînin bi matmayî lê binerin. Italo Calvîno bi awayekî hunerî bersiva van pirsgrêkan digere. Di dawîya romanê de ev herdu lehengên me yê mêr û ya jin piştî ewqas ger û şopandinê bi hev re dizewicin û romana me bi dawî dibe.

Dema em wê romanê dixwînin em baş dibînin ku nivîskar, nivîskarekî ji rêzê nîn e û dixwaze tiştên cuda biciribîne. Italo Calvîno ji bo vegotinê rê û rêbazeke nû ava dike ku armanca xwe jî ev e. Ji bo xebat û ceribandîna rê û rêbazên nû gelek nivîskara tiştên xweş û giranbiha gotine.

Di gotinên xwe yên dawî de em dikarin bibêjin ku Italo Calvîno di vegotina çîrok û romanê de guherandinên cuda û baş çêkirine. Metnên xweş derxistîne holê û xwedî wêjêke baş e. Nivîskar metnên ku dinivîse dest ji wan metnan bernade û encama wan jî dişopîne. Çîrokên curbecur dinivîse û dixwaze ku xwîner jî tevî van metnan bibe.



■ Romana Italo Calvîno «Heger Rêwîyek Di Şeveke Zivîstanê De»

Post-modernîzmê di hiş û mijîyê mirovan de guhertinên wisa mezin çê kirine ku mirov li hember van rewşan matmayî maye. Rasteraşt em dikarin bînin zimên ku jêderka Post-modernîzmê Romantîzm e û ew di sedsala hejdehan de derketîye holê. Di warê wêjeyê de ev herdu rêbar ketine nav hevûdu de û dozîna van herdu rêbaran di nav hev de ye.

Di nivîsandina romanê de serkêşîya wê tradîsyonê(rêbarê) Alaiîn Robbe-Gillet kirîye û ev rêbar di warê derketina berhemên wêjeyî û hunerî de bandoreke mezin di dema xwe de çêkirîye. Weke nivîskarên mezin ên Rojavayî Îtalo Calvîno, Franz Kafka, James Joyce, Umberto Eco û Jorge Lûîs Borges û...hwd di bin bandora tradîsyona Post-modernîzmê de mane û berhemên xwe bi wî awahî

nivîsandine. Di wir de pirsgireka nivîskar Kafka û di kîjan heyama wêjeyî de cih digire heye. Hin nirxkar wê di heyama Modernîzmê de û hin nirxkar jî wê di heyama Post-modernîzmê de nişan didin. Lê belê em dizanin ku Franz Kafka xwe wek Ekspresyonîst dibîne. Nirxkar Yildiz Ecevît di berhema xwe ya bi navê "Türk Romanında Postmodernîst Açılımlar" de jî bo binavkirina Kafka û Modernîst li hember derdikeve û wê rasteraşt di navbera Modernîzm û Post-modernîzmê bi cih dike û jî wê heyamê re jî dibêje "Heyama Modernîte". Lê em vegerin ser arîşeya xwe.

Heyama Post-modernîzmê çewa nivîskarên cihanê bandor kirîye weke Oxûz Atay, Êsiv Atilgan, Hesen Elî Toptaş, Edalet Axaoxlû, Bîlge Karasû û...hwd nivîskarên Tirk jî di bin

Romana Italo Calvîno

"Heger Rêwîyek Di Şeveke Zivistanê De" û Heyama Post-Modernîzmê

**Italo Calvîno di vegotina çîrok
û romanê de guherandinên
cuda û baş çêkirine. Metnên
xweş derxistine holê û xwedî
wêjeke baş e**



Ersin Zengin

Pirtûkên derketî

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn rêbara Modernîzmê roj bi roj erka xwe winda kir û wekî piraniya şaxên hunerî di wêjeyê de jî guhertinên curbecur çêbûn. Di wejêyê de nîrxên kêr cihê xwe bi nîrxên nû ve guhertin. Ji bermayêyên demên hevçerx romanên rastîhêz û wek bermayêyên di wê demê de hatine nivîsandin di pir alîyan de xwe rê û rêbazên xwe

guhertin, weke berê di berhemên xwe dersan nadin, nivîsandin bi awayekî din dest pê kir, şêwe û mijara romanûsîye guherandin.

Ev dema ku piştî rêbara Modernîzmê dest pê dike em jê re dibêjin dewra Post-modernîzmê. Em dikarin bibêjin ku heyama Post-modernîzmê di avahîsazîyê de dest pê kirîye û ji wir jî derbasî berhemên hunerî yên din bûye.

Têbîneke din jî em ê di romana kurdî de bibînin, ew jî ew e ku gelek serlehengên wan romanên jin in. Bi tilîyên nivîskarên mêr hatine afirandin û bi pêûsa wan hatine livandin. Heşt, êş, xem, eşq û gazine wê bi pêûsa mêran li ser rûpelan hatine rêzkirin. Ev jî dihêle em bi ser xwe de biramin û ji xwe bipirsin çima pêûsa jinê di warê romanivîsê de qels e?! Çima dengê wê nîne?

Di dirêjahîya dîrokê de hatîye naskirin ku jinên Kurd ne weke yên cîranên xwe girtî ne, ew vekirî, desthilatdar û di civatên mêran de xwedî gotin in. Di kevneşopîyên kurdan de jina Kurd gelek caran pêşengtîya civakê û mêran jî kirîye. Ji alîyekî din ve jina Kurd ji mêj ve di nav edebîyetê de hene û gelek caran bûne serkêşên govendê. Dema mirov li wêjeya Kurdî ya devkî û muzîka wan binêre, bi hêsanî mirov dikare vê yekê bibîne. Lê ev têrê nake, ji ber ku pêdivîya edebîyata me ya nûjen bi nivîskarên jin heye. Rast e ku di van salên dawî de çend nivîskarên Kurd ên jin roman bi Kurdî nivîsîne û jîyana jinê ya rengereng kirine mijarên babetên romanên xwe, lê heya roja îroîn hejmara wan bi qasî tilîyên destan tîn jimartin.

Ji xwe hejmareke mezin ji jinên Kurd roman nivîsîne, lê ne bi zimanê xwe. Mixabin wan berê xwe dane zimanê bîyanîyan û pê nivîsîne. Gelek ji wan jinan îro di nav civaka Erebb, Faris û Tirkan de navdar in. Ew jibîrdikin ku her berhemek tenê

dikeve xizmeta çanda zimanê ku pê hatîye nivîsîn. Ango em nikanin nav li wan bikin nivîskarên romana kurdî û berhemên wan tucarî nakevin xizmeta çanda Kurdî de.

Jin xwedîyên heştên zîz in, baldirêj, bêhnfireh û canfeda ne. Ew dikarin di xebatên wêjeyî de karên baş bikin û berhemên heja biafirînin. Hin taybetmendîyên wê hene, bi mêran re tune ne. Mêr bi qasî jinê êşên wê nizane û nikare bîne ziman. Di hin waran de mêr bixwezin jî nikarin wekî wê binivîsin. Ew nikanin wekî wê heştên dilê xwe bidin der, ne jî karin pîrsgirêkên jîyana wê pêşkêş bikin. Beşdarbûna jinê pêwîstîyeke girîng e, hem ji bo pêşxistina civakê, çand û edebîyata Kurdî, hem ji bo zêdetir pêşveçûna romanê. Lê ev gotina me nayê wateya ku tenê jinên nivîskar dikarin, di berhemên xwe de, li pîrsgirêkên civakê û kêşeyên zayendî xwedî derkevin û tenê ew dikarin di nav xêzên romanên xwe de serdestîya dengê mêran bi dawî bînin. Tekez romannivîsên jin bi nerîn û têgihaştineke jinane karin hinek mijaran vejînin, dikarin balê bikişînin ser hin alîyên veşartî yên jîyana jinan û bi taybetî alîyên di civakê de ku hîn veşartî mane.

Em bawer in ku çawa zimanê Kurdî bi saya dayikên Kurd hate paraştin, her wiha jîndar maye, wêjeya Kurdî jî nemaze romana Kurdî dê bi saya wêjevan, wêjehez û nivîskarên jin ên Kurd bi pêş ve biçe û dewlemedtir bibe.



■ Tabloya - Heyfa Îsmayîl

ku bi “Bavê romana Kurdî” hatiye binavkirin, hin romanên din wek Jîyana Bextewar, Hopo, Dimdim û... nivîsandin. Ew hemû bi gelek zimanan derketin. Piştî navên hin romanivîsên din jî berz bûn, lê bi rastî hejmara wan pir kêmtir bû. Bêguman gelek sedemên wê yekê hene. Ya sereke sîyaseta nijadperest û şovînîzma dewletên dagirker e, ku zimanê Kurdî qedexeyê kirin û zarokên kurd, ji piçûkanîyê de, bi zimanekî biyanî û li ser çandeke biyanî perwerde kirin. Helbet pêşxistina wî zimanî wek tê xwestin pêk nayê. Ji aliyekî din ve civaka bindest, ya bê dewlet, ji çanda xwe ya resen dûr dikeve û edebîyata wî zimanî beyar dimîne. Edebîyata ku bi hezar zor û zehmetîyan bê afirandin jî bêguman dê qels bimîne. Eger em xwedî dewlet bana, dibistan hebana

û zarokên me bi Kurdî perwerde bûbana, bi Kurdî pirtûk, kovar rojane bihatana weşandin, dê romana Kurdî jî dewlemendtir û xurtir biba.

Piştî salên 2000î ku guherîneke girîng di civaka Kurdî de pêk hat û wêjeya kurdî, bi taybetî jî romana kurdî, hem bi hejmar hem jî bi rengînîya naverokan kete nav geşedaneke berçav. Ji wê demê ve hejmara nivîskaran û berhemên wan ber bi zêdebûnê ve diçe û derfeta çapkirin û belavkirina wan berfirehtir dibe.

Eger em romana kurdî bi hûrbînî bişopînin em ê bibînin ku li beramberî romanên neteweyên derdorên kurdan, neteweyên ku xwedî dewlet û desthilat in, romana kurdî ji yên wan ne kêmtir e. Romana kurdî gavine balkêş avêtine û hemahema gihiştîya asta romanên cîhanî.

Jin û Romana Kurdî



**Jin xwedîyên hestên zîz in,
baldirêj, bêhnfireh û canfeda
ne. Ew dikarin di xebatên wêjeyî
de karên baş bikin û berhemên
hêja biafirînin.**



Vejîna Kurd

Jin û Çand

Roman cureyeke wêjeyî ye, bi çand, raman û zimanê civaka ku tê de hatîye nivîsandin ve girêdayî ye. Her wiha pêwendîya romanê bi hiş, zanebûn û xeyalên romannivîs re jî heye. Her nivîskarek ji jîyana xwe ya civakî û erdnîgarîya xwe ramanan werdigre û bi hûrbînî li ser radiweste. Lewre romannivîs dikarin bi awayekî berfireh civaka xwe pêşkêş bikin. Ew dikarin bi deng, reng, ziman, hizr û ramanên xwe yên azad sûdê li xem,

pirs, kêşe, xeyal, xewn û xwestekên sîyasî, civakî û çandî bikin û ji bo wan xebatê bikin.

Dema mirov behsa romana Kurdî dike, yekser Erebe Şemo û romana Şivanê Kurmanca li bîra wî tên. Ew roman cara pêşîn sala 1931ê ronahî dît, dûv re ji bo bi dehan zimanên cîhanê hate wergerandin û çap bû. Ango em karin bibêjin ku bi weşandina romana Şivanê Kurmanca re dîroka romana Kurdî dest pê kir. Erebe Şemo, yê

dibe, mirov dikare bibêje ku ev meydan hema hema vala ye û nivîsên ku li ser pirtûkan bi kurdî belav dibin, ji danasînê biwêdetir tiştek nîne. Carcaran jî hin gotarên pesindanê yan jî biçûkxistinê têne belavkirin. Rexnegirîya ku dibe jî bi zimanê erebî dibe. Ez ê mînaka berhemên xwe bidim, heta niha di navbera çîrok û romanê de yazdeh berhemên min bi kurdî derketine, lê ji bilî gotar û nirxandinên di rojname û kovaran de ti nivîsên rexneyî li ser wan wekî pirtûk derneketine. Bi erebî, tevî ku hemû berhemên min heta niha bi erebî derneketine jî, du pirtûkên rexneyî heta niha derketine. Yek jê li ser çîrokên min ku ji hêla rexnegirê Sûrî Mihemed Mihyedîn Mîno ve di sala 2004 an de li Himsê derket û yek jî li ser romana Sobarto ji hêla Mesûd Hesen ve li Şamê di 2006 an de derket. Her weha pirtûka sêyem li ser her şeş romanên min ji hêla Rêber Hebûn ve hatîye nivîsandin, ew ê di demeke nêzik de derkeve.

- Di der barê wergera berhemên te bo zimanên din de, çi agahî hene?

Weşanxana Endêşe li Silêmanîyê di weşandina hemû berhemên min bi soranî de, berdewam e. Berhema di dorê de û wê nêzik bi soranî derkeve romana “Fîrîna bi baskên şikeştî” ye.

Weşanxana Afraz li Îranê wê nêzik dest bi weşandina berhemên min bi Farisî bike û ji bo wê “99 morîkên belavbûyî” di dorê de ye.

Piştî Ingilîzî, Erebi, Tirkî û Farisî

wergera romana min “Gava ku masî tî dibin” ya îtalî qedîya ye û wê di demeke nêzik de ronahîyê bibîne.

Wergera romana “99 morîkên belavbûyî” ya Elmanî îsal amade dibe. Ev pirojeyê wergerê ji hêla nivîsgeha çandê “kulturbüro” ya bajarê ku ez lê dijîm Wuppertal hatîye finansekirin.

Wergera “Wehşê di hundirê min de” ya Ingilîzî tê amadekirin.

Wergera Erebi ya “99 morîkên belavbûyî” ji bo weşanxaneyê Sefsafa li Misrê tê amadekirin.

Piştî “Mirî ranazîn”, “Tîrsa bê diran” û “Gava ku masî tî dibin” wergera Tirkî ya “Sobarto” jî amade ye û li benda çapê ye.

Bi giştî ev pirojeyên wergerê yên di derbarê berhemên min de, niha li ber destan in.

-Projeyên te yên paşerojê çi ne?

Ji 2011 an û vir de ti pirtûkên min yên çîrokan derneketine. Ez niha wan çîrokên xwe yên ku min di vê demê de nivîsandine berhev dikim û wan ji bo çapê amade dikim. Dibe ku pirtûka min a bê ne roman, lê pirtûkeke çîrokan be.

-Rêzdar Helîm Yûsiv ji bo vê hevpeyvînê gelek spas, heger gotineke te ya dawî hebe kerem bike bêje.

Gelek spas ji bo we jî, ji bo her kesê ku keda wî di amadekirin, weşandin û belavkirina Şermolayê de heye. Bi hêvîya berdewamî û pêşveçûn û serkeftinê.



-Li gor we, çiqasî girîngîya pêşangehên pirtûkan di vejandina wêje û aktîvkirina rola tevgera çandî de heye, her wiha bi giştî çi bandorê li civakê dike?

Pêşangehên pirtûkan derfeteke baş e ji bo avakirina têkilîyeke rasterast di navbera nivîskaran û xwendevanan de, di navbera pirtûkan û civakê de. Lê ji ber tunebûna bazareke berfireh a pirtûkê di nav kurdan de bandora vê çalakîyê pir bi sînora dimîne. Alîyê din ê mijarê ew e ku şeweyê awayê çekirina van pêşangehan nêzîkî şeweyê Ereba ye. Pêşangeh bi giranî ji bo firotina pirtûkan vedibe. Lê li cem Ewropîyan bi awayekî din e. Wekî mînak ez ê behsa pêşangeha salane ya navdewletî ya Frankfurt Elmanyayê bikim, ku her sal di meha dehan de çêdibe. Pêşangeh pênc rojan dewam dike, sê rojên destpêkê tenê ji bo weşanger, wergêr, nivîskar û pisporane û tenê herdu rojên dawîyê ku şemî û yekşem

e rê li ber derbasbûna xelkê vedibe. Di her sê rojan de weşanger, weşanxane, nivîskar, wergêr, ji hemû deverên dinyayê tîr û hevdu nasdikin, kontrakt û peymanan bi hev re imze dikin. Bi vî awayî berhemên wêjeyî bi hemû zimanan li hemû deverên dinyayê tîr çapkirin û belavkirin. Wisa jî semîner û civatên hevnasîn û danasînê bi zimanên cuda tîr lidarxistin. Piştî ev bazar di navbera pisporan de diqede, roja dawîyê xelk derbasî pêşangehê dibin û her yek berê xwe dide cihê weşanxaneyê ku lê digere û dikare pirtûkan bikire. Beşdarbûna kurdan di vê pêşangeha navneteweyî de, eger hebe, vekirina standekê ye, danîna ala kurdî ye û vexwarina çayê ye.

- Wêje bi rexnegirîyê bi pêş dikeve, tu rexnegirîya kurdî çawa dibînî?

Eger mebesta te bi rexnegirîya kurdî ew be, ya ku bi zimanê kurdî

taybetîya rewşa kurdan ya sîyasî û civakî bike. Ji bo kurmançî ez dixwazim vê bêjim, ku ji sala 1995'an û vir de mirov dikare behsa qonaxeke nû ya wêjeya kurdî-kurmançî bike û roman jî di nav de. Ji ber ku wan salan li bakurê Kurdistanê û Turkîyê qedexe, heta radeyekê, ji ser kurdî hatibû rakirin û dest bi derketina kovar, rojname, pirtûk û weşanxaneyên kurdî bibû. Dibe ku şensekî min ê baş be, ku ez yek im ji wî nîfşê ji salên notî ve dest bi belavkirina berhemên xwe yên bi kurdî kiribû. Ji wan salan heta niha bi dehan romanên kurdî hatine nivîsandin û belavkirin û geşbûneke berbiçav di vî warî de rûda. Dema mirov behsa aştî romana kurdî bike, divê ez du tiştan jî nav hev derxînim, yek jê girêdayî rewşa kurdan, ya welatê wan û qedexekirina zimanê wan e, ku ew jî hejmare. Hejmara romanên kurdî beramberî hejmara romanên bi zimanên din, ji ber sedemên behsa wan bû, pir kêr e. Tiştê din aştî wêjeyî û hunerî ye, ez wê li gor şopandina xwe baş dibînim. Di kurdî de îro bi dehan berhemên hêja yên di asteke baş de tên dîtin û mirov dikare wan bilind binirxîne. Di hemû zimanan de, li cem hemû miletan, kurd jî di nav de, weha ye. Berhem pir tên nivîsandin, lê yên ku bilind bêne nirxandin hindik in.

-Tu tevgera wêjeyî û çandî li kurdistanê bi giştî û bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê çawa dinirxîni?

Ev bîst sal in ku ez ji derveyî welêt

dijîm. Di van salên dawîyê de û piştî vê pêla penaberîyê ya berfireh û rewşa ku li Rojavayê Kurdistanê rûda, têkilîyên min yên civakî hêdî hêdî bi nas, heval û dostan re vegeyîyan. Berî wê dûrbûn û jihevqutbûneke mezin çêbibû. Di van bîst salan de bi dehan nivîskarên nû derketin ku ez wan nasnakim, berhemên nû derketin ku negihîştine ber destê min. Ji ber vê bersiva pirseke weha pir zehmet e ji bo min û ez di der barê hûrgilîyên rewşê de ne ewqasî agahdar im.

-Dibêjin bandora jîngeha nivîskar di berhemên wî de der tê, ev bîst sal in tu li Ewropayê dijî, kîjan berhemên te encama serpêhatî û dîtinên te yên Ewropayê bûn?

Pirtûka min a çîrokan a bi navê “Auslander beg” di sala 2011an de derket. Ev pirtûk bi temamî li ser jîyan û serpêhatîyên kurdên Ewropayê ye. Bûyerên romana min “99 morîkên belavbûyî” bi temamî li Elmanyayê diqewimin. Beşekî mezin ji çîrokên pirtûka min “Memê bê Zîn” ku di 2003 an de derket li Berlînê û li ser rê û rêçikên bajarên Ewropayê diqewimin. Jixwe rexneya min a li nivîskarên kurd ên berî min herdem ev bû, ew çima li ser serpêhatîyên xwe, serpêhatîyên kurdên li Ewropayê dijî ku bi sedhezare, nanîvisîn. Ji bo min, çawa ku nivê jîyana mina li welêt jêdereke bê sînor a nivîsandinê ye, wisa jî ev nivê din yê jîyana min a li xerîbîyê wê bimîne çavkanîyeke bê sînor ji bo nivîsandina çîrok û romanên.

rûpelên spî. Lê bi derbasbûna demê re û berfirehbûna serbore û tecrubeyê re, ez pê hisîyam ku êdî kirasê çîrokê li gewdeyê êşa min biçûk bûye û nema tê hiltê. Ji ber ku cureyê herî nêzikî çîrokê roman bû, carekê min xwe dît ku waye ez romanên dinîvisînim. Ev veguheztin wekî pêdivîyekê û jixwebere hat. Ji roja ku min rahiştîye qelemê û heta îro min herdem rê li ber pêlên agir ên ku ji kûrahîya hinavên min derdikevin, vekirîye. Çavê min li wî agirî û guhê min li ser dengê dilê min e, ew berê min didin kuderê, ez diçim wê deverê. Di vê dema dawîyê de firehîya mal û kolanên romanê ez hinekî ji biçûkbûna ode û sikakên çîrokê dûr xistime. Lê ez carcaran bêrîya wan sikak û kuçeyên çîrokê dikim, ji ber ku dilê min ê “ewilî” ew bû, çîrok bû.

-Heta niha çend berhemên te derketine, ya destpêkê çî bû û kîjan salê derket. Her wiha ji me re behsa berhema xwe ya dawîn “Fîrîna bi baskên şikestî” bike?

Heta niha di navbera çîrok û romanê de, yazdeh berhemên min derketine. Yekem berhema min a çapkirî “mêrê avis” bû, ku bi zimanê erebî di sala 1991’ê de li Şamê hate weşandin. Çîroka nivîsandina romana min a dawîyê “Fîrîna bi baskên şikestî” ku li ser berxwedana Kobanê ye, ji bûyerên romanê bixwe xemgîntir e. Di 2014’an de, min jî weke her kurdekî rewşa Rojava, dorpêçkirina Kobanê ji hêla Daiş ve dişopand. Di destpêka şer

de min û hin keç û xortên ku li Kobanê diman, me behsa nivîsandina romanekê kir, li ser wê qonaxa dîrokî ya ku Rojava bi giştî û Kobanê bi taybetî tê re derbas dibû. Diva bû hemû çîrok û bûyerên ku li Kobanê diqewimin ji min re bişînin. Her weha di dawîya 2015’an de min Cîhan Hesen, birayê wê Rodî û xwişka wê Gulîştan me hevdu li Stenbolê dît û li ser nivîsandina romanê me lihevkir. Ew vegeerîyan Kobanê û ez jî vegeerîyam Elmanyayê. Bi dehan nivîs û çîrokên ku min dixwestin ji min re hatin. Min jî dest bi nivîsandina romanê kiribû. Hetanî ew şeva ku nav lê kirin şeva xedrê bi ser Kobanê ve hat. Di wê şevê de Rodî, zavayê bîst rojan û Perwîna bûka bîst rojan û dîya Rodî û birayê wî yê mezin û ji wê malbatê tenê dora deh kesan û ji Kobanê dora sêsed kesî bi wî awayê hovane şehîd xistin. Ji nav wan û spas ji Xweda re ku Cîhan di wê tevkujîyê de sax ma. Ew bûyer bû sedem ku ez veciniqim û çar salan rawestim. Piştî wê careke din li nivîsandina wê romanê vegeerîyam. Vê carê roman ne ji çîrokên ku Cîhan û Rodî û Perwîn ji min re dişandin pêk dihat, lê belê ew bi xwe bûn kesên sereke yên vê romana nû ku bi navê “Fîrîna bi baskên şikestî” hat nivîsandin û belavkirin.

- Romana Kurdî ji salên ku te dest bi nivîsandinê kirîye heta niha çiqasî bi pêş ketîye, û niha di çî astê de ye?

Mirov nikare behsa rewşa romana Kurdî bike, bêtir ku mirov behsa

-Di serî de bi çend hevokan xwe bi xwînerên Şermola bide nasîn.

Di sala 1967'an de li Amûdê di nav malbateke kurd de jidayikbû me. Di nav çar bira û sê xwişkan de biçûkê bira bûm. Hetanî bekelorya min li Amûdê xwend û mafnasî -hiqûq- li zanîngeha Helebê xwend. Ji sala 2000' î de li Elmanyayê dijîm. Heta niha min şeş roman û pênc pirtûkên çîrokan belavkirine.

-Tê gotin ku tiştî nivîskar dinvîse encama tiştên ku xwendîye, her wiha nivîsandin ji nû ve vesazkirina peyvên ziman e, ji bo te nivîsandin çîye?

Ji bo min nivîsandin qeder bû. Qedereke weha bû, ku bêtî haya min ji min hebe hat pêşîya min. Heta niha ez carinan vê qederê reş û carinan jî spî dibînim. Ji ber ku nivîsandinê hemû jîyana min serobinoyî hev kir û heta niha ez nikarim weku kesên din bi aramî û rehetî bijîm. Nivîsandin hem dojah e ku agirê wê bi rih û can ketîye û nema vedimre û hem jî bihuştî min e, ya ku di hemû rojên giran de, di hemû erdhej û şewatan de, xwe lêdigrim û xwe dispêrim hênîkayîya wê.

-Li gor gelek wêjevan û rexnegiran niha roman di serdema xwe ya zêrîn de ye, hemû cureyên wêjeyî yên din li şûn xwe hiştine, gelo tu bi vê nerînê re yî?

Heta radeyeke mezin ev dîtîna rast e.

Di nav hemû celebên wêjeyî de, di vê sedsala me de hunera romanê li pêşîyê ye. Di bazara pirtûkan ya cîhanê de jî bi vî awayî ye. Eger em bala xwe bidin Ewropayê, ku weke navendeke çanda cîhanê ya hemdem tê naskirin, gelek weşanxane hene ku ne helbestan û ne çîrokan çap nakin û naweşînin. Di bawerîya min de vê dîyardeyê roleke dualî di pêvajoya nivîsandina romanê de lîstîye. Ji aliyekî ve hunera romanê geş bû, çav hemû li ser in û li her deverê bi germayî tê nivîsandin, weşandin û xwendin. Lê ji aliyekî din ve her kesê ku dikare rahîje pênuşê dev ji helbestê û çîrokê berdide û berê xwe dide nivîsandina romanê. Bi vî awayî nivîsandina romanê dikeve rengê “modeyê” û kî radibe xwe lê diceribîne. Ev yek hejmara berhemên bê aşt, yan jî yên di asteke nizim de zêde dike. Di encamê de di hin derûdorên de, ku dengê rexnegirîyeke cedî tune ye, wekî derdorên Kurdistan her tişt tevlihev dibe û pîvan jî wîndî dibe. Ev yek rê li ber tevlihevîyên mezin di vî warî de vedike.

- Ji ber ku tu çîrok û romanê jî dinivîsî, gelo çî cudahî di navber wan de heye û tu bêhtir di kîjan cureyê de xwe dibînî?

Min bi çîrokê dest bi nivîsandinê kir û bi romanê berdewam kir. Niha jî di nivîsandina hem çîrokê û hem romanê de berdewam im. Di ciwanîya xwe de, di destpêkê de, ez pê dihisîyam ku çîrok têra min dike û ew dikare hemû xirecira hinav û gîyanê min derxîne ser

Nivîskar û Romannivîs "Helîm Yûsiv" Ji "Şermola" re:

Di vê dema dawîyê de firehîya mal û kolanên romanê ez hinekî ji biçûkbûna ode û sikakên çîrokê dûr xistime



Hevpeyvîner: Aram Hesên

Hevpeyvîna hejmarê



Li Amûda Rojavayê
Kurdiştê ji dayik bûye
Fakulteya mafnasîyê, li
zanîngeha Helebê qedandîye.

Ji sala 2000'î ve li
Elmanyayê dijî

Xelata romana kurdî di
sala 2015'an de wergirt. Xelat
ji hêla weşanxaneyê Endêşe li
Silêmanîyê – Başûrê Kurdiştanê
hate dayîn.

**-Birêz Helîm Yûsiv em bixêrhatina
te dikin û kêfxweş in ku te hinek
ji dema xwe ji bo me veqetand.**

Ez jî kêfxweş im, ku mêvanê we û
mêvanê Şermola me îro. Hûn di nav
xêrê de bin.

Kurdî li dûrî rexnedayînê ye. Belkî li vir û li wir hin pêûs di wî warî de li ber xwe didin, lê weke tê xwestin rola xwe nelîstine. Lewra rêjeyeke ne hindik ji berhemên wêjeyî ji helbest, çîrok, roman...hwd, pir têne weşandin. Ji ber nivîskarên wan berheman dizanin ku nakevin ber destên rexnevanan û kesê ku bê xwendina wan berheman jê re bidin çepikan jî hene. Eger tevgera rexneyê çalak nebe, jîyana wêjeya Kurdî bi pêş nakeve.

Rewşa wêjevanên Kurd:

Nivîskarên Kurd bi şêweyekî giştî di jîyana xwe ya nivîsandinê de rastî gelek dijwarî, kêşe û pirsgrêkan tên. Piştî berhema xwe ya wêjeyî dinivîse, divê bi xwe li derfetên çapkirinê bigere û heger derfet jê re lêhat, ji berîka xwe angû bi pereyên xwe çap dike. Eger berhem çap bû, vêca bi xwe jî li xwendevanan belav dike û piranîya wan jî dîyarî dide. Ji be ku sazîyên li berhemên wêjeyî xwedî derkevin û jê re karê çapê bikin û biweşînin tune ne. Angû bi kedeke kesayetî û pir bi dijwarî berhem ronahîyê dibînin. Lewra beşek ji wêjevanên Kurd gelek berhem û belkî zor baş jî nivîsîne, lê ji ber ku nikarin çap bikin û biweşînin bi salan li ba wan mane. Yanî wêjevanê kurd karê nivîsandin, çapkirin û weşanê jî divê pê rabe, da ku berhema wî bigihe ber destên hin xwendevanan. Belê, jîyana wêjeya Kurdî di vî warî de, di reweşeke pir zor û dijwar de ye. Lê vîna wêjevan û nivîskarên Kurd

di ser wan dijwarîyan re gav dike û berdewamîyê dide wan. Bêguman ev jî cihê şanazî û serbilindîyê ye.

Gelo gunehê weşanxaneyên Kurdî jî di vî warî de heye?

Bawer im piranîya weşanxaneyên Kurdî bêtir girîngîyê didin alîyê diravî û bazirganîyê. Ev yek jî bi şêweyekî giştî ji wêjevan û nivîskarên re hin kêşe û sînoran peyda dike. Lewra hin berhemên wêjeyî yên ku ji dahênerîyê stêwir in çap dikin. Ji ber ku xwedîyê berhemê pirsgrêkên diravî li cem nînin. Angû weşanxane girîngîyê nadin naveroka berhemê û ne jî rewşa nivîskar. Piranîya wan jî ne li ser bingeş û pîvanên wêjeyî diweşînin. Lewra jî hin berhem piştî çapkirinê dikevin ber destê xwendevanan û ji pîrbûna şaşîtiyan hema hema nayên xwendin. Lê di van salên dawî de hin weşanxane hatine avakirin û pîr-hindik li gor kanebûna xwe hêvîyên nivîskarên bi cih tînin. Bêguman karê wan cihê rêzgirtin û spasîyê ye.

Weke me dîyar kir, wêje bi şêweyekî giştî roleke pir girîng di jîyana miletan de dilîze û beşek ji gîyanê civakê ye. Lewra divê bi hemû hêza xwe civak li wêjevan û wêjeya xwe xwedî derkeve û bi çavekî nîvgirtî lê nêhêre. Ew têkilî û hevcewîtiya di navbera wêje û ziman de bi resenî nasnameya neteweyî diparêze. Ji ber ku parastina wêje, parastina ziman bi xwe ye, her weha ya zimên jî parastina hebûna me ye. Divê em hebûna xwe ji windabûnê biparêzin.

nivîskaran di lêkolînên xwe de dîroka wêjeya Kurdî vedigerînin berî çend sedsalan, ango serdema nivîsandinê li ser rûpelan. Bêguman berî wê dîrokê wêjeya kurdî qonaxeke dirêj de jîyaye. Lê mixabin ta niha wek tê xwestin ronî nedîtîye.

Rola wergerandinê di jîyana wêjeyê de:

Wekî çawa ku wergerandin ji hemû saxên zanistê re girîng û sûdmend e, her weha di jîyana wêjeyê de zor girîng e. Di rêya wergerandinê re, ne tenê wêjeya miletekî ji miletên din re tê naskirin, lê belê roleke erênî jî di pêşvebirin û pêşxistina jîyana wêjeyê de dilîze. Lewra miletên pêşketî bendewariyê pê dikin û ne tenê wêjîya xwe werdigerînin zimanên din, lê wêjeya miletên din jî ji bo zimanê xwe werdigerînin. Bi wê xebatê hem pirtûkxaneya xwe ya wêjeyî dewlemend dikin û hem jî sêdeke nirxdar didin ber destên nifşan. Ji ber sazîyên wan ên di vî warî de pîspor hene, lewra karê wergerandinê bi şêweyekî zanistî û dûrî tewşankîyê dibe.

Mixabin, ta niha wergerandin derbasî jîyana wêjeya Kurdî nebûye. Belkî li vir û li wir hin berhemên Kurdî ronîya wergerandinê dîtîbin, lê karine tekane ne. Ew jî ji encama têkilîyên nivîskaran bi wergêran re ye. Ji alîyekî din ve, ta niha pirtûkxaneya Kurdî di warê berhemên wergerandî de pir

lawaz e. Vêca gelo çawa wêjevanên Kurdî dê karibin sêde ji wêjeya cîhanê werbigrin? Bawer im di dema niha de Kurd dikarin wergerandinê derbasî jîyana wêjeya xwe bikin, her weha ta astekê dikarin hin ji wêjeya cîhanê wergerînin zimanê Kurdî û pirtûkxaneya wêjeyê di vî warî de dewlemend bikin. Lê xuya ye wêjevanên Kurd jî mîna rewşa Kurdan a giştî ye. Bi pirnav û kêma kar in!

Rexne û wêje:

Zanista rexneyê mijareke pir fireh e. Rola rexneyê di jîyana wêjeyê de zor girîng û pêwîst e. Dema ku nivîskar berhema xwe ya wêjeyî dinivîse, bêguman li gor têgihîştina xwe pê de diçe û bi hemû zanebûna xwe hewil dide ku bi şêweyekî baştir biafirîne û bigihîne ber destên xwendevanan. Piştî ku berhem çap dibe, hingê xwendevanên jêhatî nemaze yên di warê mijarên wê berhemê de pîspor in, ne tenê ciwankariya berhemê, lê belê bi çavekî rexneyî jî dixwînin.

Rexnevanên jîr û jêhatî bi şêweyekî zanistî derbasî naveroka berhemê dibin û bi hûrbînî ji alîyê ziman, teknîk, ciwankarî, raman û mijarê ve dinirxînin. Lewra rexnekirina wan ji berhem û nivîskarê wê re sêdeke bêhempa ye. Lê heger mebesta rexnegir tenê ew be ku lawazî û alîyên neyînî di berhemê de diyar bike, hingê roleke neyînî dilîze.

Mixabin ta niha jîyana wêjeya



■ Wêjeya Kurdî

Hin çîrok bi dehê şevan dihatin gotin û bi dawî nedibûn. Belkî hin çîrok ji wan hîn li ba kalemêr û pîrejînan hatibin paraştin, ger lêkolîn li ser wan bibin ê dîyar bibe ku gelek ji wan ne çîrok, lê belê roman in. Mixabin piranîya wêjeya devokî nehate tomarkirin û bi xwedîyan re çû gorê. Beşa ku mayî jî hîn wekî tê xwestin nehatiye komkirin û ronî li ser rûpelan nedîtîye. Dibe ku sedemên nekomkirinê hebin, lê zor pêwîst e ku bi şêweyekî komxebatî hewildan çê bibin.

- Wêjeya Kurdî ya nivîsandî:

Nivîskarên ku xwe di warê dîroka wêjeya Kurdî de mijûl kirine û hin lêkolîn dane ber destên xwendevanan, biraştî karekî baş kirin, lê ne têr. Ji ber ku jîyana wêjeya Kurdî ya nivîskî di bêtirî qonaxekê re derbas bûye. Lewra xebatên tekane pir dijwar in ku karibin wê raştî û dîrokê vekolînin. Ya raşt ew

e ku sazîyek an bêtirî sazîyeke pispor bi şêweyekî komxebatî yan bi hevkarî di vî warî de kar bikin, da ku karibin bi şêweyekî zaniştî dîroka wêjeya Kurdî ya nivîskî binivîsin. Ji ber ku dema nivîsandin derbasî jîyana zimên bû, hîngê bi gelek şêwe û abêyan heşt û raman hatin nivîsîn.

Di wan serdemên kevin de hemû berhemên nivîskî li ser kevir, dîwarê şkeftan, li ser tehlûşkan - Qermîdan û belkî alavine din jî dihatin tomarkirin. Piranîya wê belgekirinê di zikê şopewarên wan serdeman de mane. Bêguman di nav wan nivîseran de berhemên wêjeyî jî hene û piranîya wan ta niha jî nehatine belgekirin û ne jî lêkolîn bûne. Da ku em bi şêweyekî zaniştî dîroka wêjeya Kurdî ya nivîskî nas bikin, divê komxebatek ji alîyê sazîyên şopewarnas, kesên ku bi abêyên kevnar pispor û wêjenasan ve çê bibe. Eger xebateke wisa nebe, dîroka wêjeya Kurdî zelal nayê naskirin. Hin

Ji ber ku xwe di Kurdî de newestandine û dewlemendîya wî nas nekirine, lewra wisa dibêjin. Ango gunehê xwe dixin stiwê zimên de. Vêca tiştê seyr, hin jî bi tundî berevanîyê di ber nêrîna wan de dikin!

Du qonaxên dîrokî yên wêjeya Kurdî:

Pir normal e dema em bibêjin wêjeya kurdî bi dîroka gelê Kurd ve girêdayî ye. Rewş û bûyerên ku jîyana gelê Kurd tê re derbas bûye, bandorên xwe yên erênî û neyînî li jîyana wêjeya Kurdî kirine. Jîyana wêjeya Kurdî di bêtirî qonaxekê re derbas bûye û pêdivîya lêkolîneke dirêj pê gerek e.

Piştî rûxandina dewleta Mîdî û ta roja îro, jîyana gelê Kurd serûber hate guhartin û di hemû waran de bê sazî û dezgeh ma. Bêguman bandoreke neyînî hem li jîyana gelê Kurd û hem jî li ya wêjeya Kurdî kirîye. Lê wekî ku çawa şoreşên Kurdan li pey hev pêl dane û ta niha jî ranewestîne, her weha wêjevanên Kurd jî bi şeweyên curbecur li gor rewş û derfetan wêjeya Kurdî parastine. Lê xuya ye ku demeke dirêj bi devokî hatîye gotin û parastin. Lewra em ê çirûskeke ronahîyê bidin jîyana vê qunaxê.

- Wêjeya kurdî ya devokî:

Hemû hunerên wêjeya Kurdî ji çîrok, destan, helbest û her weha zargotin, efsane û roman bi şeweyekî

devokî li ser zimanê kesan dihatin gotin û ji alîyê kesine din ve ku meraqdarê wêjeyê bûn li ezber dibûn. Beşekî ne hindik di rêya stranên re jî hatîye parastin. Lewra zor girîng e ku lêkolînên berfireh di vî warî de werin kirin, da ku bêtir rastî û dîroka wêjeya Kurdî bi zelalî were nivîsandin.

Gelo wêjeya Kurdî ya devokî li ku dihat gotin û çawa beşek jê hatîye parastin? Dibe ku gelek bersiv ji vê pirsê re hebin û dibe jî ku piştî bersivdayînê ji alîyê şarazayên wêjeyê ve bibe mijara rexnegirîyeke tûj û tund. Dibe jî hin bibêjin ne bersiveke zaniştî ye û ji bayê xeyalê ye. Lê xwedî pênûsên ku di warê jîyana folklorê kurdî de mijûl in, bawer im ji bersivê venaciniqin û belkî ji wan re bibe mijara lêkolîneke berfireh. Beşek ji bersiva wê pirsê ev e:

Demeke dirêj civaka Kurdî bê dewlet û sazî maye. Bê rêxistîneke giştî û rêvebirîyeke navendî jîyan derbas kirîye. Lewra jî li gor zagonên civakî yên her serdemekê hatîye dabeşkirin û ji alîyê axe, beg, mîr û serokên êlan ve hatîye birêvebirin. Weke tê nasîn ku mîr, beg û axe xwedî eywan bûn û piranîya serokên êlan xwedî konên mîna eywanan bûn. Belkî di dema niha de jî ev hebe. Hîngê her eywanek û konek nemaze li şevên zivîştanan ên dirêj mîna navendeke rewşenbîrî û çandî bû. Xelk lê dicivîyan û çîrok, helbest, destan, serpehatî, stran û ji hemû hunerên zargotinê ji alîyê kesine ku ji xwe re kiribûn kar dihatin gotin. Vêca kesên meraqdar jî ezber dikirin.

hêvanê wêje ye, lê belê nasname ye jî.

- Çawa ziman hêvanê wêjeyê ye?

Wêje bi hemû hunerîya xwe bêguman peyv, gotin û hevok in. Dengkirin jî wisa ye. Lê tiştê ku berhema wêjeyî ji yên din cuda dike, yek ji wan ziman e. Ya din zanebûna wêjevan ji bikaranîna zimên re ye. Lewra zor pêwîst e ku wêjevan di warê zimanê ku pê dinivîse de jêhatî be û zanibe çawa û bi çi şeweyî zimên têxe xizmeta berhema xwe ya wêjeyî de. Di vir de bikaranîna zimên di hemû hunerên wêjeyê de ne mîna hev e. Ango zimanê ku pê helbestê tê hûnandin û yê ku nivîsandina çîrokan nemaze di warê têgeh û şeweyê nivîsînê de ne mîna hev in. Lewra wêjevanê ku baş dizane melevanîyê di deryaya zimên de bike, baş têdigihe ku çawa zimanê mijara xwe bikar bîne. Lê heger wêjevan di zimên de lawaz be, dê hevokan vir de wê de bikopilîne û nikare weke ku dixweze berhemê têr bike. Ne jî dikare karê afrandin û naybdariyê peyda bike û berhemeke nirxdar bigihîne ber destên xwendevanan. Kesê ku dixweze derbasî warê nivîsandina wêjeyî bibe, divê têbigihe ku ziman hêvanê wêjeyê ye. Eger vê rastîyê piştguh bike, pir zor e ku berhemeke balkêş û astbilind binivîse.

- Çawa ziman nasnameya wêjeyê ye?

Wêjeya her miletekî bi zimanê wî

miletî tê nivîsandin û pirtûkxaneya wêjeyî pêk tîne. Dema ku tê gotin wêjeya Kurdî tavi lê mirov têdigihe ku bi zimanê Kurdî hatiye nivîsîn. Her weha wêjeya hemû miletên cihanê wisa ye. Lê carinan hin wêjevan dibêjin ku “nasnameyeke taybet ji wêje re nîne, wêje wêje ye û hew”. Vêca dema merev li sedema wê gotinê digere, serastê tê naskirin ku berhemên wî ne bi zimanê wî yê mak-dayîk in, lewra wisa dibêje. Ango reva ji rastîyê ye.

Gelo ne ji mafê wêjevanên Kurd e ku bi zimanekî ji bilî zimanê xwe yê dayîkê wêjeyê binivîse? Bêguman ji mafê wan e ku bi bêtirî zimanekî binivîsin, lê ew berhemên wî tu carî ji wêjeya Kurdî nayên jimartin û xizmeta pirtûkxaneya Kurdî nakin.

Hin Kurdên ku pê nûsa wan di zimanê Erebi, yan Tirkî yan jî Farisî de li pêş e û bi wan zimanan berhemine wêjeyî bi şewayekî afrînerî nivîsîne û bi zimanê xwe yê mak jî çar hevok nenivîsandine, gelo berhemên wan dikevin lîsteya wêjeya kurdî, her weha navê wan ji yên wêjevanên Kurdî tên jimartin? Li gor nêrîna min bêguman na. Lê wêjevanê ku bi gelek zimanan nivîsî be û Kurdî jî sêwî nehîştibe, bêguman ji wêjevanên kurd e.

Carinan jî hin ji Kurdên ku wêje bi zimanine din dinivîsin û pê nûsa ji Kurdî stêwir kirine, dibêjin “Kurdî têra derbirîna heştên me nake. Li gor berhemên me yên wêjeyî kurdî lawaz e” Bêguman gunehkarîyeke pir mezin di der mafê Kurdî de dikin. Ya rast gunehê wan e, ne yê zimanê Kurdî ye.

derbas dike û civakine din jî sûtê jê werdigrin.

Wêje nasnameya gelan e:

Tê gotin ku wêje “gîyanê miletan e”. Her weha hatîye gotin “wêje awêneya gelan e”. Belê gotinine rast in. Ango dema mirov bixweze şarîstani û pêşketina mejîyê miletekî nas bike, ya rast ew e ku berî her tiştî wêjeya wî miletî bi hûrbînî bixwîne. Ne tenê weha, lê belê wêjeya her miletekî gîyan û beşekî girîng jî rastîya wî ye. Wêjeya her miletekî rola xwe di parastina çand û dîroka wî de dilîze û serdem li pey serdemê dide ber destên nîşan. Ango mirov dikare bibêje ku wêje bi hemû hurên xwe mercek jî yên zindîbûna gelê xwe ye. Di dîrokê de û di dema niha de jî, miletên ku têdigihin rol û girîngîya wêje çî ye? Bi gelek şeweyan bendewarîyê bi wêjeya xwe dikin û dahênana wêjevanên xwe piştguh nakin. Ji bo wê guhdanê sazîyên wêjeyî ava dikin û hemû alîyên jîyana wêjeya xwe bi hûrbînî raçav û lêkolîn dikin. Wê ûştê jî di zanîngehên xwe de jî her hunereke wêjeyî re şaxekî taybet damezirandine û didin xwendin.

Miletên ku wêje û wêjevanên xwe sêwî dihêlin an weke tê xwestin lê xwedî dernakevin, beşekî pir girîng jî nasnameya xwe ya çandî û neteweyî piştguh dikin û encam neyînî li wan vedigere. Miletê ku bi hemû kanebûn û zanebûna xwe li nasnameya xwe ya wêjeyî xwedî dernekeve, bêguman nikare li pêş pêlên lawazî û windabûnê sînor û bendan ava bike. Eger weke tê

xwestin bendewarî bi wêje û wêjevanên Kurd bibe, bêguman pir dirêj nake ê bigihîne asta wêjeya cîhanî. Ev gotin ne jî berê dilnazîyê ye û ne jî xewnerojk e. Lê belê rastî bi xwe ye. Ji ber ku wêjeya kurdî xwedî nasnameyeke resen e. Lê mixabin rewşa jîyana wêjeya kurdî jî mîna ya hemû warên jîyana gelê Kurd ne li saz e!

Wêje û Ziman:

Gelo çî têkilî di navbera wêje û zimên de heye? Wekî me dîyar kiribû ku hemû hunerên wêje jî berên mejîyê mirov e, lê di rêya zimên re têne derbirîn. Ango heger ne jî zimên ba, heşt û ramanên mirovan ê di serî de bimana û nikarî bi tevgera endamên bejna xwe derbibirîna. Lewra mejî û ziman jî wêje re du dayîkên hevçêwî ne.

Wekî ku çawa tu hêz nikare zagonên pêşketina civaka mirovahîyê rawestîne û hertim civak bi demê re tê guhartin û pêş ve diçe, her weha tu kes nikare pêşvebirina wêje jî zimên biqetîne. Her ku mejîyê mirov di hemû warên jîyanê de pêş ve diçe, jîyana zimên jî li gor wî pêş ve diçe û bandorên xwe li jîyana wêjeyê dike. Ne tenê hevçêwî, lê pêwendîyeke resen di navbera zimên û wêjeyê de heye. Zimanzanê cîhanî Bofon dibêje: “Eger mirov bê ziman ba, dê wek meymûnan bima û hişê wî pêş ve nediçû”. Dixwezim bibêjim: Eger ne jî zimên ba, belkî tiştek navê xwe wêje tune ba. Ne jî mirovan dikarî heşt û ramanên xwe bigîhandana hev û jî hev re rava bikirana. Ziman ne tenê

Rola Wêje Di Civakê de û Jîyana Wêjeya Kurdî

**Parastina wêje, parastina
ziman bi xwe ye, her weha
ya zimên jî parastina hebûna
me ye. Divê em hebûna xwe jî
windabûnê biparêzin.**



Merwan Berekat

Lêkolîn

Mejîyê mirov jêdera şariştanî, pêşvebirina jîyanê, dahênan û naybdariyê ye. Li gor zaniştê, mejîyekî tekane yê kesayeti û mejîyekî giştî yê civakekê heye. Lewra mejîyê giştî jî avakirina şariştanîyê re bingehekî raşt û durîst e. Lê nayê wê wateyê ku mejîyê tekane yê pêşketî bê rol e. Di dîroka mirovahîyê de û di gelek civak û serdeman de kesan, nemaze feylesof, wêjevan û zanîyanan beşekî mezin ji

têgihîştin, raman û jîyana civakên xwe guhartine. Di vî warî de gelek nimûne hene, lê mijara me ne di wî warî de ye.

Wêje bi hemû şax û hunerên xwe ji berê mejîyê mirov e. Derbirîna heşt, meraq û ramanên mirov e. Lewra çendî mejîyê mirov li pêş û têzanîn be, ewqas wêjeyeke ciwan, xurt û nirxdar diafirîne û bandora wê afirandinê li xwendevan û civakê dibe. Dema ku bendewarî pê dibe, sînoren civaka xwe

deştêpêkê: (Rebil) RABELAÏS / GARGANTUA (Gardiyenşuwa) 1534 Fransa.

Di edebiyata dinyayê de romana modern ya deştêpêkê: (Sorvantês) CERVANTES / DON KÎŞOT Îspanya. 1605

Di edebiyata kurdî de romana deştêpêkê ya Erebe Şemo ye. Şivanê Kurmanca. 1935 Ermenîstan.

Hûrgiliyên romanê

Çend xalên ku pêwîst e di romanê de li ber çavan bînin girtin

-Di her alî de teswîra lehengan bê kirin; psîkolojî, cilûberg, bejin, kîlo, rengê rû û çav, xweşîkbûn, sîkbûn, axaftin, ken û li hemberî bûyerên xweş û ne xweş helwestên wan û guherîna rengê rûyê wan...

-Li gorî demsalan behsa rewşa hewayê bê kirin.

-Li gorî demsalan behsa heywanên kûvî bê kirin.

-Ciyê bûyer lê diqewine, teswîra hundir û derveyî xanî, gund, bajar, çem, çiya û derdorê bê kirin.

-Eger ciyê bûyerê gund be, behsa heywanên malê, eger li bajêr be behsa heywanên di hundir de bê kirin.

-Rewşa lehengan ya aborî û xwendinê...

-Têkiliya endamên malbetê bi hev re û bi derdorê re

-Taybetiyên lehengan yê herî baş û ne baş...

-Baweriya wan ya olî û meyla wan ya siyasî...

-Rewşa wan ya tendurîstiyê...

-Rewşa wan ya zewacê, temenê wan û eger hebin jimara zarokên wan...

Di romanê de rengên vegotinê yê sereke ev in:

Teswîr:

Di romanê de yek ji riyên herî zêde ku serî lê tê dayîn teswîr, hunerê çêkirina resim û dîmen bi gotinan e. Romannivîs bi sûdgirtina ji hunera teswîrê bûyeran, derdor û kesan li ber çavan zindî dike, tîne ber çavan û di xeyalê de dîmen diafirîne.

Tehlîl:

Ji bo eşkerekirin û şîrovekirina rewşa lehengên romanê ya dinyaya hundir, tehlîl yek ji rengê vegotinê ye ku serî lê bê dayîn. Di vegotina xwe dispêre tehlîlê de ji bûyerê wêvetir, taybetiyên kesan û wateya bûyeran girîng e. Ji ber wê romannivîs dixwaze bi tehlîlan wijdan, ruh, xwestekên lehengan yê veşartî û tiştên nayên fêmkirin derxe meydana. Di vê vegotinê de nivîskar rewşa leheng ya heşt, fikir û psîkolojîk rave dike.

Diyalog:

Diyalog, cihê axaftina lehengan ya li hemberî hev e. Di romanê de diyalog, bi awayekî berfireh cî digirin. Di romeneke baş de axaftina li hemberî hev, divê ji bo temenê lehengan, derdora wan ya civakî, perwerdeya wan û aştî çanda wan guncaw be.

de nivîskar dixebite ku fikrekî, hizrekî bi xwendevanan bide qebûlkin. Yan jî dixwaze çîneke civakê mezin, yan jî piçûk bike.

4-Romana Psîkolojîk: Di vê beşa romanê de cîhana lehengan ya hundir û rewşa wan ya derûnî dibin mijara vegotinê û tîkiliya kesan ya bi civakê re û ka çawa bandorê li hev dikin tî vegotin.

5-Romana Otobiyoğrafîk: Di vê beşa romanê de nivîskar behsa jiyana xwe dike û bi berfirehî vedibêje.

6-Romana Biyoğrafîk: Di vê beşa romanê de jiyana, yan jî beşek ji jiyana kesên navdar bi teknîka romanê tê vegotin.

7-Romana Fantazî: Ev beşa romanê li ser hêza xeyalê tê avakirin. Weke “Nehat Dinê Zarokê Pîroz”

8-Romana Egzotîk: Di vê beşa romanê de danasîna welatên dûr tê kirin.

9-Romana Pîkaresk: Bi zimanê Îspanî tê wateya kesên serserî. Di vê beşa romanê de jiyana û tevgerên kesên serserî, rezîl û bêexlaq tî vegotin.

10- Romana Robar: Di vê beşa romanê de bûyer û geşedanên di nava civakê de, yan jî bûyereke dîrokî bi çend cildan tî vegotin.

11-Romana Romantîk: Di vê beşa romanê de heştên ol û baweriyê li pêş in. Ji mîtolojiyê sûdê digire. Xwe dispêre heştan.

12-Romana Popûler: Di vê beşa romanê de nivîskar bangî girseyên berfireh dike. Armanca wî ne çêkirina huner e. Dixwaze raştiya bûyerê bide. Ji bo wî ya girîng bûyer e. Bi zimanekî

xwerû dinivîse.

13-Romana Nû: (Alegorîk, Eştetîk, Sûrrealîst, Banderî, Xwedayîna der)

Alegorîk: Di vê beşê de fikir, helwest, çalakî û heşt bi sembolan tî ravekin.

Eştetîk: Nivîskar di vê beşê de girîngiyê dide rê û rêbazên eştetîkî-xweşîkbûnê. Xwendevanên wê girseyeke diyar e. Naveroke wê bi hêsanî nayê fêmkirin. Jê re ne girîng e ku raştiya bûyerê bide. Sûrrealîst: Hizrê ser raştiyê re. Nivîskar dixebite dinyaya xef ya xeyalan rave bike.

Banderî: Fikrek, bandoreke bûyerekê, cihekî, yan kesekî di serê mirovekî de hiştî. Ev beş xwe dispêre heştan. “Min wisa jê fêmkir ku naxwaze li cem bîmînim.”

Xwedayîna der. Di vê beşê de leheng hizir û heştên xwe bi tona axaftinê yan bi tevgerên bedena xwe dide der. “Dema bûyer bihişt birhên xwe di nava hev re derbas kirin.”

14-Romana Post Modern: Post modernîzim, fikrê ku divê bê lêpêrsîna modernîzmê, hin nirxên gerdûnî ku pêwîst e bî qebûlkin, red dike.

15-Romana Zanişt û Xeyal: Di vê beşa romanê de nivîskar, xeyalên tiştên hê nebûyîn, belku di dema pêş de pêk werin, di hişê xwendevan de dide afirandin. Ji bo zaniştê jî hedefekê nîşan dide. Hin tişt piştî gelek salan pêk tî.

Romanên Destpêkê

Di edebiyata dinyayê de romana

Cudabûna di navbera roman û serhatîyan (hîkaye) de û taybetiyên wan yên nêzîkî hev

-Roman û serhatî dişibihin hev lê ji hev cuda ne.

-Di serhatîyan de xala bingehî bûyer e. Di romanê de xala bingehî qereker, ango şexis e. Serhatî li ser bingehê bûyeran, roman li ser bingehê sexsan tîn sazînin.

-Serhatî li gorî romanê kurt in.

-Di serhatîyan de bûyer kêmtir in.

-Di serhatîyan de danasîna qerekeran bîşînor e û yekalî ye.

-Di serhatîyan de teswîra dem û cî kêmtir e.

-Roman ji xwendevanên xwe re serhatiyê vedibêje, ji ber wê serhatî bingehê romanê ye.

Cudabûna di navbera roman û çîrokan de

-Cudabûnên di navbera roman û serhatîyan de, cudabûnên di navbera roman û çîrokan de ne jî.

-Roman xwe dispêre bûyerên asayî û rastî yên qewimîn, yan yên gengazîya qewimîna wan heyî. -Çîrok, bi giranî berhemên xeyalên gel in û bi gotinê heta roja îro hatine.

-Di çîrokê de bûyerên ne asayî yên hatîn serê mirov, heywan, pîrevok, dêw, cin, perî û yên weke wan tîn vegotin.

-Hem roman, hem çîrok her du jî hunerên vegotinê ne.

Formên vegotina romanê 2 ne:

1-Formê dema boriyê nêzîk. Çû, girt, hat, kuşt... Di vî formî de nivîskar dibe şahidê her tevgera lehengan.

2-Formê dema niha, ku çîrok jî bi vî formî tê gotin. Diçe, dike, digire, dike... Di vî formî de nivîskar ne şahidê bûyeran e, ji devê kesê sisiyan bihiştine.

Li gorî mijarê beşên romanên:

1-Romana Dîrokî: Di vê beşa romanê de bûyer, yan jî kes dibin mijara vegotinê. Nivîskar bûyerên dîrokî bi hêza xeyala xwe re dike yek û vedibêje. Kuroş, Îskender, Napolyon û Ramses ji wan in.

2-Romana Macerayê: Ev beşa romanê xwendevanê xwe dike kelecane, ber bi xwe ve dikeşîne û

bûyerên pir balkêş vedibêje. Romanên Polîsî jî dikevin vê beşê.

3-Romana Civakî: Di vê beşa romanê de jiyana mirovan, çanda wan û bûyerên civakî û siyasî yên bandoreke kûr li mirovan dikin tîn vegotin. Di vê beşa romanê de urf-adet, bawerî carna bi çavê rexnegirî, carna bi zaniştî tîn destgirtin.

Romanên Civakî jî du beş in: Romana Kevneşopîyan, Romana Dozê.

Romana Kevneşopîyan: Di vê beşa romanê de nivîskar urf-adetên civakê rave dike.

Romana Dozê: Di vê beşa romanê

Uslûb: Qabiliyeta nivîskar ya bikaranîna ziman yê xweserê xwe heye. Hin hevokên dirêj saz dikin, hin jê dikarin hevokên kurt bicibînin. Hin hevokên berovajî bi kar tînin, hin yên raşt. Hin jê ji hêza gotinên pêşyan û biwêjan sûdê digirin. Ji vî rengê vegotinê re tê gotin ‘Uslûb’. Ji sedî sed divê ziman û hevoksaziya wê raşt be û bi qalibên zimanekî biyanî neyê nivîsîn. Nivîskar, dema romanê dinivîse, ji bîranînên xwe, çavdêriyên xwe yên şexsî û nişeyên xwe yên piçûk sûdê digire.

Nêrîna bêjer

Nêrîna serdest (Îlahî): Bêjer di nava bûyeran de cihê xwe nagire û tevî bûyeran nabe. Di çarçoveyê fireh de li bûyeran dinêre. Haya wî ji her tiştî heye; hizrê di serê lehengan de derbas dibe, heştên wan, dinyaya wan ya hundir, ka berê çawa jiyane, wê paşrojê çi bikin, agahiyên wan yên herî veşartî bi awayekî hûrgirî dizane. Nivîskar ji lehengan pirtir dizane. Vegotin bi devê kesê sisiyan tê kirin. “Dihizirî ka wê çawa xwe ji wê xeterê rizgar bike. Di wê navê re tişteke hat bîrê.”

Nêrîna leheng: Bêjer yek ji lehengên romanê ye. Nivîskar bûyeran bi nêrîna leheng vedibêje. Agahiyên li cem bêjer; bi bûyerên leheng dibêje, tiştên dîtî û bihiştî bisînor in. Bûyer bi devê kesê yekê tînin dayîn. “Ez dereng çûm malê. Dema bavê min ez dîtîm, hêrs bû.”

Nêrîna çavdêr: Bêjer di nava bûyeran de cihê xwe nagire û bi awayekî bêalî vedibêje. Lewre di rewşa çavdêriyê de ye. Agahiyên li cem nivîskar ji yên li cem lehengan kêmtir in. Di romanên bi vî nêrîna hatî nivîsîn de, nivîskar cî nade agahiyên veşartî, heştan, xeyalan û dinyaya hundir ya lehengan. Bûyer bi devê kesê sisiyan tînin gotin. “Çû malê. Dema bavê wî dît pir keyfxweş bû. Ji bo salvegera bûna wî diyariyek dayê”.

Taybetiyên Romanê Yên Sereke

Taybetiyên ku pêwîst e di romanê de hebin ev in:

-Di romanê de bûyer bi awayekî berfireh digel tiştên hûr tê vegotin.

-Di romanê de bûyer tev li derdora bûyereke pêş dikevin. Li derdora bûyera bingehe bûyerên piçûk hene.

-Di romanê de şexsî pir in û di her warî de danasîna legengên romanê tê kirin.

-Di romanê de vegera ber bi dîroka ve dibe.

Di Romanê de Senaryo

Senaryo ew e ku nivîskar amûr û alavan ji dinyaya raşt digire û di dinyaya xwe ya xeyalî de bi awayekî hunerî dihone. Senaryo berhema xeyala nivîskar e û li hev aniye, lê ji raştîyê ne qut e.

Qereker: Kesên tevgerên wan yên xwesarî wan heyîn ji wan re tê gotin ‘Qereker’.

Di romanê de bi teswîran danasîna aliyên şexsan yên hundir û derve tê kirin û nivîskar têtîliya wan ya bi derdorê re derdixe meydana. Nivîskar tiştên di serê lehengan de derbas dibe dixwîne û dinirxîne.

2-Di romanê de honandina bûyerê

Di romanê de ji bo çalakiyên kesan tê gotin bûyer. Yek ji stûnên romanê yên bingehî honandina bûyeran e. Nivîskar çawa ku dikare bûyerên di jiyanê de zanîn, yan jî çavdêriya wan kirî bigire dest, dikare yên di xeyalên xwe de zindî kirîn jî cî bide wan. Di romanê de li derdora bûyera bingehî gelek bûyerên din jî diqewimin. Her yek ji van bûyeran aliyekî lehengê romanê dide naskirin. Dibe ku bûyer her tim li gorî kronolojiya demê neçin, nivîskar dikare teknîka vegera ber bi şûn ve jî bi kar bîne û rêzê xerab bike. Di romanê de divê nivîskar cih nede bûyer û detayên bêwate. Lewre qîmetê berhem kêr dikin.

3-Di romanê de cî

Yek ji stûnên romanê jî cî ye. Di romanê de cîyên bûyer lê diqewimin, ji wan re tê gotin cî. Weke mirovên di jiyanê de, lehengên romanê jî li herêmekê, li bajarekî, li gundekî, li taxekê dijîn. Çawa dibe ku bûyer li

deverên wiha fireh biqewimin, dibe ku li cîyekî weke nexweşxane, dibistan, yan li malekê jî biqewimin. Lê dibe ku li hin deverên xeyalî jî biqewimin. Weke di romanên zanişt û xeyalê de.

4-Di romanê de dem

Dem jî stûneke bingehî ya her romanê ye. Lewre bûyer teqez di nava demê de diqewimin. Di romanê de bûyerên tîn destgirtin di demeke diyar de derbas dibin. Di navbera destpêkirina bûyerê û dawîya wê de pêvajoyek heye. Ji vê pêvajoyê re tê gotin dem. Nivîskar, carna dem -ku ji dema borî, dema niha û dema bê pêk tê- ji dema niha ber bi dema bê ve diherikîne, carna jê bi bîranînan ber bi şûn ve dibe. Lewre mirov ji her sê deman pêk tê.

5-Di romanê de ziman û vegotin.

Berhemên wêjeyî li ser bingehê ziman derdikevin meydana. Ji ber ku roman jî beşek ji wêjeyê ye, ew jî hunerekî ziman e. Romannivîs ji her derfeta ziman sûtê digire û dinyayekê ava dike. Dixebite ku bawerî bi wê dinyaya ava kirî were û ji dinyaya me be. Ji ber wê jî neçar e ku ziman û uslûbekî guncaw bi kar bîne. Weke her berhema wêjeyî, di romanê de jî uslûb û vegotin pir girîng in. Divê ji zimanê axaftinê yê rojane cuda be, zimanekî xweş be û bi peyvên bibandor, biwêj û gotinên pêşîyan bê xurtkirin.

neqandin. Kesên bikêmayî, kesên seqet nayên dîtin. Hûrgilî li ser mirovên bijare û gihiştî tê kirin. Nûnerê vê beşê yê herî girîng François Fenolen e. (Frensowa Fenalin) Navê wî yê rast, François de Salignac de la Mothe ye. (Frensowa Di Silînyak le Mont) Di romanên Tirkan de ev beş nayê dîtin.

Romana Realîst:

Di vê beşa romanê de nivîskar di hîzîre ku di çêbûna kesayeta mirov de girîngiya derdor heye. Digel vê, derdor bi awayekî berfireh tê ravekirin. Ji ber wê danasîna lehengan li gorî qereker, temen û derdora xwe tê kirin. Teswîra qereker û urf û adet girîng in. Leheng hema hema li her derê û di her kêliyê de derdikevin pêşberî me. Çawa ku ji navê wê jî tê fêmkirin, ev beşa romanê xwe dispêre bûyerên rast û aqil lê pêş e. Di vê beşê de taybetiyên lehengan yên hundir tên dayîn. Di wêjeya dinyayê de Lev Nikolayevîç Tolstoy, (1828 Rûsya) Anton Çehov, (1860 Rûsya) Fyodor Mihaylovîç Doştoyevski, (1821 Rûsya) Honore de Balzac (Anorî di Balzac) (1799 Fransa) û çend kesên din ev beşa romanê nivîsîne.

Romana Natûralîst:

Di vê beşa romanê de taybetiyên lehengan yên hundir nayên dayîn, taybetiyên li ber çavan tenê tên dayîn. Tehlîla psîkolojîk nayê kirin. Nivîskar pir nakeve kûrayiyê. Di vê beşa romanê de teswîra derdor pir

ne girîng e. Teswîra tiştên dilê mirov ji wan dixele jî tê kirin. Li gorî van nivîskaran, jiyan ji xwestekên hundir yên tiştên beredayî, sik û bêrûmetiyê pêk tê. Derdora xerab kesên ne baş diafirîne. Emile Zola (2yê Nîsana 1840. li Fransa-Parîsê hatiye dinê. Pirtûka wê bi navê Meyxane ye) Alphonse Daudet (Alfons Dodey 13ê Gulanê 1840 Fransa) û çend kesên din ev beş nivîsîne.

Stûnên romanê 1-Lehengên romanê

Yek ji stûnên bingehî yên romanê leheng in. Lewre roman li ser kesan tê avakirin. Taybetiya van kesan ya herî girîng, divê di civakê de yên wisa hebin. Ango divê lehengên romanê yan bi şêkil û şemala xwe, yan bi taybetiyên xwe bişibihin mirovên di jiyandê de em wan dibînin. Taybetiyên wan yên awarte nînin. Lehengê romanê yê sereke dibe ku nivîskar bixwe be: “Ez çûm malê. Piştî ku min xwe şûst ez nivîstîm.” Dibe ku lehengê romanê yê sereke kesê sisiyan be. “Piştî ku gihat malê destpêkê çeka xwe veşart, pişt re cilên xwe guhertin.” Di romanê de bi giranî lehengê sereke kesê sisiyan e. Dibe ku lehengê romanê yê sereke kesê duduyan be. “Piştî ku tu gihatî malê destpêkê te çeka xwe veşart, pişt re te cilên xwe guhertin.” Ev rêbaz nayê tercîhkirin.

Tîp: Kesên meyl, yan jî taybetiyên çîneke civakî di kesayeta xwe de di hewînî, ji wan re tê gotin ‘Tîp’. Tîpê kînoj, tîpê girtî, tîbê germ û hwd.

jiyanê rengîn û xurt dibe.

Baş e, roman çî ye?

Bi kurtayî roman ev e: Bi awayekî dirêj, digel diyarkirina cî û demê, nivîsa bûyerên qewimîn yan bûyerên gengaziya qewimîna wan heyî û bi awayekî berfireh honandina wan bi bûyereke mezin e. Dibe ku vegotina serhatiyeke rast be, dibe ku senaryo be.

-Di romanê de li derdora bûyera tê destgirtin gelek bûyerên piçûk jî tîn vegotin.

-Di romanê de divê cî û dema bûyerê bîn diyarkirin. Digel vê divê derûniya kesên di romanê de jî bê ravekirin.

-Roman bûyerên civakî û siyasî yê serdema behsa wê tê kirin ji me re radigihînin û serdemeke diyar ronî dikin.

Di romanê de plan

Di romanê de bûyerên bîn destgirtin mentiqê pêşketina wan tê çêkirin. Ji ber ku li derdora bûyera bingeî hatî destgirtin bûyerên piçûk jî diqewimin, girêdana di navbera kes û bûyeran de bi planeke baş mûmkin e. Di romanê de naverok jî bi vê plansaziyê çêdibe.

Di romanê de destpêk, geşedan û encam hene.

Di romanê de beşa destpêkê

Di vê beşê de danasîna bûyerên

dibin mijara romanê, cî, derdor û kesan tê kirin. Digel wê teswîra dem, kesan û derdorê jî tê kirin.

Di romanê de beşa geşedanê (girêk)

Di vê beşa romanê de, bûyer dikevin rewşeke di nava hev de û mereq û kelecana xwendevan pêş dikeve. Di romanê de dibe ku gelek beşên bigirêk hebin. Ev beşa herî dirêj e.

Di romandê de beşa encamê

Di vê beşê de encama bûyeran derdikeve meydanê û mereq û kelecana xwendevan kêr dibe. Di hin romanên de nivîskar dikare encamê bi hêviya xeyala xwendevan ve bihêle.

Beşên romanê

Roman li gorî fikir-rêbaz, mijar û naverokê dibin sê beş.


- 1-Romanên Klasîk
- 2-Romanên Realîst
- 3-Romanên Natûralîst

Romana Klasîk:

Ev beşa romanê girîngiyê dide mirov. Hebûnên derveyî mirov, cilûberg, dekor, xemil û دنیا di plana duduyan de ne. Lehengên romanê ji tebeqeya jorê, ji arîstokratan hatine

Roman

**roman ev e: Bi awayekî dirêj,
digel dîyarkirina cî û demê,
nivîsa bûyerên qewimîn yan
bûyerên gengazîya qewimîna
wan heyî û bi awayekî berfireh
hûnandina wan bi bûyereke
mezin e...**



Dîyar Bohtî

Dosyaya hejmarê

Roman Çi ye? Taybetiyên Wan, Beşên Wan, Naveroka wan?

Roman çi ye? Roman tê çi wateyê?
Di romanê de behsa çi tê kirin, yan jî
naveroka wan li ser çi ye?

Çima gelek beşên romanên tîn
nivîsîn? Ji xwesteka afrandinê ye, yan
vegötina fikrê nivîskar e?

Peyva “**ROMAN**” di zimanê latînî
de tê wateya “nivîs”. Ji bo danasîna
romanê danasînên cuda hatine kirin.
Xala wan ya hevberş wiha ye: Di
romanan de, serhatî û serboriyên
mirovan bi awayekî berfireh tîn
vegötin. Roman heşt, hizir û dinyaya
mirovan ya xeyalê pêş dixe. Ev jî hişê
mirovan pirtir dixe nava tevgerê û
hêza afrîneriyê xurttir dibe. Tecrûbeya

Li Romannivîsekî Rast Digerim

Em nikarin di romanê de, rewşên sîyasî û civakî wekî ku di axaftin an jî civîneke sîyasî de bigrin dest xwe. Mînak, dema tu dest bi nivîsandina romanekê bikî – em bibêjin roman li ser min- tu dikarî ji temenê zaroktîyê dest pê bikî, an jî bi pêwendîyên ku min çêkirîye, an jî, ji bûyerên têkoşîna min bi hinekan re û an jî pêwendîya min bi wê jinê re. Belkî destpêkek asan û kurt be, lê misoger e ku wê te biajo deryakî ji bûyer û zûlan(deta). Tiştê herî girîng bi vê mijarê ve girêdayî ye, ew raştîya civaka Kurd e. Tu dikarî vê pirtûkê bi (Mirina Mêrê Kurd) bi nav bikî, an jî (Mirina Jina Kurd), an jî (Mirina Gelê Kurd) bi nav bikî. Di romana (Mem û Zîn) de helbestvan Ehmedê Xanî diyar kirîye ku çêbûna evîna Kurdî di wê demê de ne gengaz e. Ev yek jî- bi awayekî bêhempa- bi rêya destaneke helbestî vebijandîye. Her wiha jî gelek evîn ên binav û deng -di nava gelên cînar de hene, wekî di wêjeya Erebbî de çîroka (Leyla û Mecnun) û di nava şoreşa me de jî Zilan û çîroka evîna wê ya destanewî heye.

Zilan bi çalakîya xwe, kîn û nepejirandina xwe ji hemû awayên kevnar ên jina Kurd tê de dijî dabêrin. Zilan mînakek bû li ser rêya jîyana jinê ya nû ku tu bikaribî têkevi hundir van zûlan-girêkan, tu yê şerê me, evîna me ya mezin, çelengtîya me û

serkeftinên me bibînî... Li gel min bi xwe jî derfeta nivîsandina 300 rûpel li ser rojên dawîyê-yên tijî zûlanên nazik û germîn- ên jîyana Zilan binivîsinim peyda ne.

Erkê Nivîskar û Wêjevanan Di Pêşxistina Romana Kurdî De

Ev yek ne bi şoreşê ve girêdayî ye, lê belê bi wêjevan û ramandarên Kurdan ve girêdayî ye. Derfet hene ku mirov pir û pir li ser ştran, helbest, serpêhatîyan û hwd. binivîsîne... Li gor nêrîna min, ku romannivîsekî Kurd ê rast heba û romaneke Kurdî ya rast binivîsanda, bêguman wê xelata Nobelê bi dest bixişt. Bêguman, ev xelat li benda derketina romana Kurdî ye.

Mînak, Yaşar Kemal heya niha ev xelata wernegirtîye... Hun dizanin sedem çi ye?... Ji ber ku Yeşar Kemal hemû raştîya Kurdî venabêje û diyar nake; lê tenê hinek alîyan vedibêje. Ger ew bi Kûrahî û bingehîn li ser raştîya realîta Kurd bisekinîya, wê bi asanî ew xelata wergirta... Gotina wî nivîskarê Rûs ê ku te ji min re qalê kirî tam rast e. Axa me bakîre ye û bi hewceyî gelek ked û dayînê ye, hunermendê Kurd divê ku ji birçîbûna xwe ya ramanî û hizrî xelas bibe. Va ye me pêngava yekê pêk anî û ew axa bakîr me cot kir, li vir jî rola hunermend û rewşenbîrên Kurd tê, ji bo ku bi karê xwe rabin û rola xwe ya dîrokî bilîzin.

de ye, lingekî wan jî, di civaka îro de ye. Sîya her du alîyan jî li ser van kesan xuya dibe. Ev kesanîyetên hane, di demên girîng de dertên û dixwazin weke xwe bikin. Ev yek jî hatine rexnekirin. Bi taybetî analîzên serokatîyê di van xalan de pêşketinên girîng deranîne û ev analîzên bingehîn in. Ji ber vê yekê jî ev analîz, ji bo romaneke şoreşgerî dikare bibe wesîle û dikare alîkarîya romaneke wiha bike. Ev xetên hane di analîzê de hatine xuyakirin. Analîza kesanîyetên bingehîn di nav jîyanê de, di nav şer de, bi tecrûbekirin hatîye çêkirin û derketîye holê. Yanî ev analîzên hane ne xeyal in, raştîyên ku têkoşînê deranîne, li holê ne. Ji ber vê yekê jî wesîleyên ku di edebîyata gelek welatan de tune ne, me bi dest xistine. têkoşîna rizgarîya netewî ku partîya me serokatîyê jê re dike, qehremanî, xîyanet û yên xwe li rîya navîn digirin, deranîye holê. Ev jî ji bo romanê alavên pir mezin in. Heya tenê li ser demekê li ser kesanîyetekê, li ser tîpekê jî dikare were nivîsandin. Daxwaza me tenê ew e ku, nameyên wan ên bingehîn, ên ku bi prosesa partîyê û têkoşîna netewî ve girêdayî ne, derînin holê. Bingeha romanê ji alîyekî ve raştîya dagirkerîya Tirk a faşîzma kemalist, ji alîyê din ve jî raştîya Kurdistan'ê ya eşîrtî-feodalî ya sedsalên navîn wê bîne ziman. Ji alîyê din ve jî wê rewşa kedkar, karker û gundîtîya xizan, kesanîyetên ku ji benê eşîrtî-feodalîyê hatine qetandin û têkilîyên

van kesan bîne zimên! Bi xwe di wateyekê de PKK ev e. Roman jî van pêşketinan bi hunerî hîn pêşvetir dibe. Di romanê de him berhemeke pêşketina şoreşê heye, him jî rengêkî dide pêşketina şoreşgerî. Erê, her çiqas şoreş bi roman, helbest, wêne û muzîkê pêk nayê jî, lê ew dikarin di nava pêşveçûna wê de, rola xwe bilîzin. Kesanîyet û tîpên bingehîn hene, lê çiqas tîpên mîna hev bi axivin, malzemeyên romanê ewqas dewlemend dibin. Ji ber vê yekê jî bi bijartin û bi sentezê roman dikare çêbibe. Di bingeha romana ku em dixwazin bidin, li ser grupên cuda cuda lêkolîn çêdibin. Em li dijî kîjan jîyanê reaksiyonê nîşan didin, heşt me ji jîyanê çawa re heye? Ev têne pîrskirin û xwestin. Dîsa çi baş e, çi bedew e, çi rast e, çi şaş e, çi bedew nîn e, çi xerab e? Ev pîrsên hane jî bi awayekî vekirî têne pîrskirin. Ji ber ku roman li ser van xalên bingehîn bi pêş dikeve. Ji kû ve tîpên, jîyana berê çi ye, veqetandina wê, ji vê jîyanê çawa ye? Û dîsa bi jîyana nû ve çawa girêdayî ye, wê jîyanê çawa çêbikin û hun dixwazin wê çawa xurtir bikin? Ev pîrsine ku tim têne kirin.

Ji alîyekê ve pêşketin çima bilez çênabin, çima nikarin bibine milîtanên şoreşger, ev yek di kesanîyetê de dibe sedema çi? Bi stîleke rast, ji bo pêşketina şoreşê, bi vî awayî bibe alîkar.

tewrî pir e. Ev paşverûtî û xirabûn jî bermayên dagirkerî û kemalîzmê ne. Heger mirov baş analîz bike, vêga wê bibîne ku têkilîyên pêwîst ku werin qutkirin hene, lê pêwîstî heye ku, li şûna van têkilîyan ên nû, jîyaneke nû were çêkirin. Roman tê wateya xebata vê dijberîyê. Yanî raman, analîz û lêkolîna jîyan û têkilîyên paşverû dike û li şûna wan ên nû ava dike. Heger di çêkirina wê de, teknîka hunerê baş were bikaranîn, ew ê bikaribe alîkarîyeke pir mezin bide şoreşê. Heger mirov li raştîya dîroka şoreşan û civakên ku şoreş lidar xiştine binêre, bi taybetî jî rewşa wan a îro bête nîrxandin, wê were dîtîn ku, pêwîstîya romanê ji raştîya şoreşgerî tê. Pêwîst e, roman li ser vê bingehe were afirandin. Ev yeka wisa jî dikare bibe bersiv û rexnekirina wan kes û nêrînan ku dixwazin ber bi kevneperestîyê, reformîzm û modernîzmê ve bibin. Bi vê yekê re roman dibe xwedîyê xetke pêşverû, hesret û daxwazan. Û rêberîya şoreşê ji xwe re dike bingehe. Ev roman jî raştîya jîyanê bi vî rengî analîz dike û bi awakî radîkal, jîyana kesanî ku îro ber bi hilweşandinê ve diçe, rexne dike. Bi zanyarî li hilweşandina wê mêze dike. Ew wisa jî bersiva “li şûna wê jîyana kevn, jîyaneke çawa wê were avakirin?” dide. Ev jî dibe sedema di kesaniyeta mirovek an jî çend mirovan de, civak bi giştî ji nû ve were avakirin-nîrxandin. Ev kesaniyet, di bingehe de dikare bibe sedema analîzên raştîya dîrokî û

civakî. Ev kesaniyetên hane, nûnerîya kîjan têkilîyên paşverû yên dîrokî û civakî dikin? Vê yekê baş analîz dike. Ev analîz çiqasî bi kûrahî, bi bedewî û hunerî were kirin, ewqasî berhemeke hunerî ya baş dertê holê. Ev jî bi qeweta hunermend ve girêdayî ye. Hinek xeyalên xwe didine xebatê, daxwaz û hesretên xwe tînin zimên. Ez li dijî çi me, çi dixwazim, çi xera dikim, çi ava bikim, çi ne bedew e, çi bedew e, çi dikare were jîyandin, çi nayê jîyandin, çi dikare were pejirandin û çi nayê pejirandin? Van pirsan bi awakî vekirî dike û bersivên van pirsan jî dîsa bi awakî vekirî dide. Bersivên van pirsan, civakê bi giştî eleqeder dike.

Ev bingeha romanê ku em dixwazin pêş bixin, di çarçoveya van pirsan de pir-hindik dertê holê. Raştîya îro ku tê jîyandin jî, ev e. Ev raştî çiqas bi paşverûtîyê, dagirkerîyê û feodalîyê ve girêdayî ye, ewqasî jî modernîzmeke ku, şexsan cîla dike, dixwaze bibiriqîne û binvala ye. Ev yek jî derketîye holê. Dîsa welatparêzîya sexte, şoreşgerîya sexte û gelo di bin van de şexsiyet çi ne, çi nîn in? Hatine kifşkirin. Bi vê yekê re jî, rizgarbûna civakê bi nasnameya neteweyî re çawa girêdayî ye, nûnertîya vê di kesaniyetekê de çawa dibe û ev kesên ku wê nûnertîyê dikin, çawa dertên, çawa têdikoşin? Me ev hemû deranîne holê.

Qala kesên ku rêya navîn digrin jî, hatiye kirin. Ev kesên hane, lingekî wan di bermayîyên serdemên navîn

şoreşê ne. Tîpên me ji hemû taybetîyên cihekî wiha re verikirî ne. Mirov vê jî wek eybekê bibîne û xwe ji bin bikişîne jî, an jî ser bigire û bixwaze ku wiha jê xelas bibe, ne rast e. Tiştê ku di vê rewşê de divê ku were kirin ev e: Rastî baş were tespîtîkirin û bi vê re jî were têgihîştin ku ev ne çarenûs –qeder-e. Bi hilweşandina yên kevin re (paşverû), yên nû werin avakirin. Ji bo avakirina yên nû pir tişt gerek in û ev ji bo me pirsir mirin û jîyanê ye. Ji bo ku bigihîje encama xwe, divê ev yek were dîtin û di hemû herêman de bibiryar, biîrade û biberxwedanî kedkariya vê were kirin.

Di hîmê romanê de, wexta ku me karakter danî, me xwest ku em û hêlên wê yên îlmî, hêlên wê yên hunerî jî binin ber çavan. Nêzîkbûna me wiha bû. Niha jî em li ser vê yekê munaqesê dikin û roman pêş dikeve û di jîyanê de têne nivîsandin! Ev pirên ku em timî dipirsîn, li gor romanê ne. Dayîna van pirsan jî ne tesadûf e. Her rojê li ser van tewran mudaxele çê dibin ev jî nîşan dide ku, nûjenbûn ji nû ve çêdibe û ji hêlekê ve jî nîşan dide ku, ev kar çawa bi kûrayî dimeşe.

Divê mirov li hember hin têkilî û tewran reaksiyonê nîşan bide, xwestekên kevn û nû biguherîne û li şûna wê jî, xwestekên terza nû derîne holê, bi îrade û toreya civakî re, bi malbatê re, hesabê xwe bibîne. Îro di vê rêyê de têkoşînek heye. Şerê me yê îro, ji bo ku rastîya bandora malbat, eşîr û qebîleyan ji hemû hêlan ve derîne holê ye? Û deranîna rastîya

wan li ser jîyanê çawa bandor hiştine ye?

Gihîştina terzên têkilîyên nû, uslûb û xîtabên wê û dîsa her roj xerakirina yên kevn û avakirina yên nû jîyanêke romanî ye. Em dibînin ku zêdehiya temayên romanê derecê hisî ne. Derecên hisî bi îfadekirinên zaniştî têne nirxandin. Roman, di hundirê xwe de dereca hisî jî xwedî dike. Lê bi giranî dixwaze ku derecên hisî û îfadekirina wan yên gîyanî bigire.

Bersiva Pirsar “ÇAWA BIJÎN?” Roman e

Pêşketina ku îro em li vê herêmê pêk tînin, bi rastî hîmê romanê ye. Em dikarin vê yekê prosesa romana ku gelê Kurd ber bi rizgarbûnê ve dibe bibînin. Bersiva pirsar: “Çawa Bijîn?” dikare bibe roman. Em polîtîkayê, îdeolojîyê û leşkerîya şoreşê şîrove dikin, stratejî û taktîka wê pêş dixin. Heger em nikaribin bersiva pirsar “jîyan wê çawa be?” bidin, wê gavê em dibin sebeba ku şoreşa me ji pêşketina gîyanî dûr bikeve. Ev yek jî ne rast e. Ji ber vê jî pirsar “Çawa Bijîn?” ji bo milîtanek şoreşger pir girîng e. Ne tenê ji bo milîtanên, pêwîstiya pêşxistina jîyana şoreşgerî, ji bo hemû kesan wek nan û avê ye. Jixwe têkoşîna rizgariya neteweyî ya ku partiya me serokatîyê jê re dike, ev yeka deraniye holê. Di civaka me de paşverûtîya gîyanî û xirabûna

reva ber bi metropolan û Ewropayê ye, reva ji xwe ye. Di heman demê de ew prosesa reva gîyanê ya ji mejî ye. Ev prosesa hane heya gihîştîye naletkirinê jî. Her tişt bi erzanî ji deşt hatiye berdan. Welatparêzî, ji azadiya civakê hatiye dûrxistin. Em dibînin ku ev yek heya derketina tevgera şoreşgerî bûye wek trajediyê û ev trajedî jî gelekî kûr e.

Têkçûna hemû serhildanan, di vê encamê de roleke mezin lîstîye. Piştî serhildanan, yanî di prosesa terora spî de, rastîya gelê Kurd ji dema têkçûna serhildanan bêtir anîne ber tunekirinê. Tîpên ku hene di vê çarçoveyê de derketine hun dikarin şîrove bikin, bê ku hun çî ne û çî dixwazin? Ev yek jî tê wateya ku mirov bigihîje prosesa nîrxandina objektîf û rast.

Ew kesên ku bi rastîya xwe têngihêjin, nikarin bibin xwedî livbazîyên cidî. Ew bi hîsên xwe dertîne holê û ev derketin jî, ji hemû bandoran re vekirî ye. Ji bo çî? Ji ber ku ev derketin li gor rastîya wî nîn e. Haya wî jê tune. Mirov dikare vê yekê wek rengekî cehaletê bibîne. Heger hun baş bala xwe bidinê, rastîya ku hun îro tê de ne ev e. Koka we yek e, lê hun çiqas têngihîştine, nediyar e! Kemalîzmê çiqasî karibûye bikeve nava we. Malbatî û eşîrtî jî dîsa wisa. Hun ji welêt û ji gel dûr ketine. Bandora rewşenbîrîya Tirk bi rengekî demogojîk, li ser we xuya dibe. Demogojîya feodal jî li ser we dixuye. Îdeolojîya dê, bav û mezinan di we de mişt bûye! Ev ên hane jî kesaniyetên

xwe ji rastîyên bingeîn, dîrokî û hemdemî dûr xistine û veqedandine. Ji ber vê yekê jî, hun jar dimînin. Di hemû herêman de tîp û kesên ku axînan dikin, dikevîne aloziyan, zelal nabin, tûj nabin, nikarin werine analîzkirin, hene û gelek in. Ev taybetîyên kesaniyetî, heya di nav rêberîya şoreşê de jî xwe parastine û ketine nava me. Me xwest ku em vê yekê bi şûrê şoreşê yê herî tûj, ji holê rakin. Jixwe piraniya we jî gotin ku: “Rêya kurt ji bo pêşketinê ev e” û hun ji ber vê tevî şoreşê bûn. Reaksiyona we li dijî sîstemê çêbû û hun hatin. Lê jîyana we ya îro, xuya dike ku hun tiştên berê, bi hezar cureyê hê jî didomînin. Reaksiyonên li hember we jî, di nav organîzasyonê de, tê wateya şerê navbera şoreşê û dijberî şoreşê!.

Em dixwazin hîmê romanê, di prosesa pêvajoya kesên ku tevî şoreşê dibin ên partîyetîyê, hişyarbûn netewî û ji demajoya azadiya civakê ve deşt pê bikin. Romana şoreşgerî bi vê yekê jî hatiye wezîfekirin. Jarî, bêhêzî û nezelalbûnên di deştê de hebin jî, divê ku em bi wan re jî deşt bi vê xebatê bikin. Ev yek divê werê dîtin. Lewre rastî ev e. Vê yekê bi demogojîya “ez pir bihêz im, pir bibiryar im!” mirov nikare pêk bîne. Jixwe em niha baş bibînin ku dereca têkilî û nakokîyên ne cidî, nagihîjin tu encamê. Wek kesaniyetên ku xwe pir mezin nîşan didin, kesaniyetên mirî jî, bi hêsanî dikarin bibêjin ku ev kesaniyet ne li gor dema derketina

wê alîkarîyeke mezin be. Heger derfetên me dest bidana, bi dilêmên leşkerî û her wisa bi yên sîyasî re tevayî me yê alîkarî bida vê dilêma edebî jî. Ji xwe em çiqas firsendê dibînin, vê yekê jî pêk tînin. Xebata me jî, jixwe tê wateya amadekirina derfeta vê yekê!

Milîtanên ku di vê yekê de xwedî îdîa ne, pêwîst e, girîngîya hunerê, bi taybetî jî girîngîya wêje û romanê bînin ber çavê xwe û bersiva pirsê: “Mirov divê çawa bijî?” bidin. Û ji bîr nekin ku, bi vê yekê dikarin alîkarîyeke mezin bikin.

Çawa ez her tim dibêjim, mirov dikare gelek mînanan bîne ber çavan. Di dîroka hemû gelan de, hilpişkînen –gavên- wiha hene. Di dema began de, di wêjeya Kurdî de hinek pêşketin çêbûne.

Mirov dikare di destanan de çavkanîyên prosesên nedîyar û şîrovekirina wan prosesan bibîne.

Li ser hin mirovên wek Kawayê Hesinkar ku serî hildane û li ser Memê Alan hin şîrovekirinên wêjeyî hene. Ev jî, ji pêşketinên civakî hêz girtine û hatine pêşxistin. Bi şîrovekirineke bi zaravê Rojhilatê heya roja îro jî bandora xwe nîşan dane. “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanî di vê wateyê de şîrova vê yekê ye ku, otorîta qralan ji bo gel çarçoveke netewî û civakî ye. Ev çarçove jî li gora xwesteka wê demê ye. Ehmedî Xanî parçekirina ku began pêk anîne û şerên di navbera wan de tîne zimên û dide kifşê, ka ew çawa bûne esasên

pêknehatina yekîtiya netewî. Li vir beg û feodalîya ku di warê yekîtiya netewî de bûne asteng, tîne zimên. Lê ji ber ku al prosesek şoreşgerî re derbas nebûye, bi şîrovekirineke hîn xurtir nikare biqedîne û bi pêş bixe. Jixwe ji ber ku li Kurdiştanê şoreşek pêk nehatîye, mînakên romanê yên xurt jî tune ne. Ne di sedsala 18’an, ne ya 19’an û ne jî di sedsala 20’an de tune ne. Tiştê ku hatine nivîsandin jî, romanên Tirkî ne, yên ku li ser bingeha kemalîzmê derketine holê. Yaşar Kemal bi xwe jî, ji raştîya Kurdên ku asîmîle bûne û bûne Tirk, dertê ser rê û bi vê yekê jî wêjeyê didomîne. Romanivîsên wek wî gelek in. Van romanivîsan di dîroka komarê de (Komara Tirk) her tim serhildan parçe kirine û xwe bi Tirkîyeyê re kirine yek, navê vê jî kirine pêşverûtî! Heya xwestine ku exlaqê kemalîstî, qirkirin û wêrankirinê wek tiştê rewşa nîşan bidin. Di perspektîfa van romanan de, tiştên ku hene, nasnekirina raştîya Kurdiştanê ye. Înkarkirina her tiştî ye, kolandina nexweşîyên berê ne. Kurd paşverû û hov tîne nîşandan.

Dixwaze Tirk be, dixwaze Kurd be, heya îro romanên romanivîsan ên li ser Kurdiştanê, wêje û huner li ser vê bingehe pêk hatine. Helbet, ev yek jî bi xwe re wêrankirineke mezin anîye. Bi taybetî kesaniyetek şaş çêkirîye. Li hember roman û fikrên azad bûye asteng. Bi xwe re Tirkanî, koçberbûna metropolan, hovdîtina welat û gelê xwe û veqatandina ji wan anîye. Ev prosesa hane, prosesa

mirov ne bi şêwaza pesnan, ne jî zema binivîsîne, ev yek jî şaş e. Mînak: Dema ku em li ser şoreşê dinivîsîn divê yê piştgirîya şoreşê kirine jî bîr nekin, ne jî yê ku dijminatîya wê kirine... Romana hêmanê (hîm-stûn) xwe hene, vegotina herikandina çend kesayetan di nava pêşgotin, nivîng û paşgotinê de ye. Mînak, jî raştîyê dîr di nivîsandina romanê de, mirov dibe xeyalan û rabûna bi nivîsandina raştîyan wekî xwe (belge, xweser) dikeve xana wêjeya bîranînan... Hevalên me jî, di nivîsandina çîrokan de zîrek in, lê jî bo romanê tiwaneya wan a nivîsandinê tune ye. Ew jî, jî ber ku roman, li tev hemû tiştên borî jî, hinek hêmanên nû dikevin ser. Yanî romanivîs radibe wesf û vegotina tiştên ku pêwîst e bibe dike. Dema ku romanivîs bi wê nikaribe rabe, em dikarin navê (çîrokvan) lê bikin, ne romanivîs. Mînakên vê jî pir in, romanivîsên Rûsan ên navdar wek (Çernîşevskî, Tolstoy, Doştoyevskî) her wiha jî gelek mînakên jî wêjeya Firensî û wêjeyên Îslamî hene, em dikarin (Nehc ElBelaxe) نهج البلاغة mînakeke zindî li ser vê xalê bidin mirov dikare vê li ser vî xalî bibêje.

Divê Romana Kurdistanî Serbixwe Be


Dema ku li Kurdistanê bingeha romana şoreşgerî tê pêşxistin, pêwîst e, mirov jî tecrubeyên netewên din jî

feydê bibîne. Bi taybetî jî, jî raştîya romana gelên ku şoreşên bingehîn pêk anîne, mîna Frensîyan, Rûsan û yê din, ev yek girîng e. Heya hin taybetîyên şoreşa îslamê ya di dema destpêkê de, şoreşa Frensa û têkilîyên di navbera şoreşê û Vîktor Hûgo, Belzak û romanivîsên din de deyne û lêkolînan çêbike. Dîsa, gelo têkilîyên şoreşa Rûsyayê bi Tolstoy, Doştoyevskî, Çernîşevskî, Gorkî û bi yê din re çî ne? Dûv re çawa bûne paşverû û kevneperest? Bi vê yekê re jî kesaniyeteke çawa deranîne holê? Malbateke çawa, jî ber ev xalan dikare were berçavan. Romana Kurdistanê jî ber raştîya xwe ya li ber çavan, jî yê din cuda ye û yê weke wê raştîya wan tune ye. Ev xal divê were dîtîn! Taybetîyên jîyana civaka Kurdî, dîrokî ne û jî yê civakên din cude ne. Ji ber vê yekê Kurdî, dîrokî ne û jî yê civakên din cude ne. Lewma divê mirov orîjînalîtîya wê baş bibîne. Yanî romana Kurdistanê divê hinekî serbixwe be. Lêpî (teqlîd) wê zêde romana Kurdî bi pêş nexe. Lêpî romana Tirkî jî bi pey ve nebîr.

Têkoşîna me ya şoreşgerî ev yeka hane, baş deranîye holê. Livbazîyeke şoreşgerî ya baş dikare bibîne ku şoreşa me nûnere pêş ve dibe û jê re dibe neres. Bi nûnertiya jî şoreşê re dikare gelekî pêş bikeve. Dikare xebateke wiha were kirin û berhemên xurt jî derîne holê. Di vê prosesê de, têkoşîna me gelekî dorfireh bûye, heger bersiva pîrsa “Divê mirov çawa bijî” bi romanekê were dayîn,

Roman Bi Xwe Şoreş e

**Em dixwazin hîmê romanê, di
prosesa pêvajoya kesên ku tevî
şoreşê dibin ên partîyetîyê,
hişyarbûn netewî û ji demajoya
azadîya civakê ve dest pê bikin.
Romana şoreşgerî bi vê yekê jî
hatîye wezîfekirin.**



Abdulla Ocelan

Anafizên hizrî

Berî her tiştî divê em ji xwe bipirsîn: Gelo roman çi ye? Ka romana Kurdî heye yan na? Rewşa ku gelê Kurd dijî, bibe materyalek wêjeyî ji bo romanê yan na?

Wekî em dizanin di demên borî de efsane hebûn, em dikarin bibêjin ku ew jî heyanî astekê weke romanên bûn. Em dikarin navê roman li ser (Mem û Zîn) bikin. Ger em bixwazin di demên

niha de, Mem û Zîn bikin romaneke hemdem û ji her kesî ve bê têgihîştin, pêwîst e ku em ji nû ve wê bi nêrîneke nûdem û hemden binivîsin. Em ti carî nikarin bi sivikatî û durûtî nêzî bûyera romanê bibin. Li vir divê em agahdar bin û şîyar bin ku nekevin dafikên pesindayînê, ne jî dafikên zemkirinê û ne bi rastîya bûyeran re jî şer bikin. Armanca min jî vê axaftinê ew e; divê

Partîya Komunîst a Sovyetê de, vedibêje û behsa feodalên Kurd tê de dike. Lê romana yekem a ku bi zimanê Kurdî rasteraşt hatîye nivîsîn “Xatê Xanim” e ku ji hêla Elî Ebdilrehman ve di sala 1958-an de hatîye weşandin.

Ji romannivîsên Bakurê Kurdistanê Mehmûd Paksî (Hêlîn) 1984, Mihemed Ozun (Tu) 1985, li Başûrê Kurdistanê: Ibrahîm Ehmed, Husên Aref (Bajar) 1986, Mihemed Reşîd Fattah (Al-Anfal), Farhad Pîrbal, Bextîyar Elî...hwd.

Her çend li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûrîyê gelek roman hatin nivîsîn, lê ew hêj negihîştine asta ku rola xwe ya ronakbîr a pêwîst bilîzin û bandorê li raya giştî bikin, ji ber gelek sedeman:

Teknîka romana nûjen di wan de qels e, û ji bo vê jî piraniya romanên tîn çapkirin nêzî çîrokan e.

Sivîkbûna mijarên van romanên ku derdikevin digel bûyerên mezin û bilez ên sîyasî û civakî û veguherînên li herêmê di van salên dawî de, ev jî dibe sedema ku romanên derketî ne xwedî ast û nirxekî bilind in.

Di gelek romanên de hebûna şaşîyên mezin di formulasyona zimanî de, ev jî dihêle ku nirxê xwe wenda bike, tevî ku naveroka hinan ji wan girîng e.

Koçberîya gelek nivîskarên romanê - bi taybetî yên Kurd – û derketina derveyî welêt, nivîskarên dîrî bûyerên li welêt diqewimin dibe, lewma heger binivîsin jî nikarin rastîya heyî îfade bikin.

Ji bo derbasbûna vê yekê, pêwîst e ku nivîskarên romanê rêbazên nivîsandina xwe pêş bixin, nemaze di rêzimana de, her wiha pêwîst e di naskirina dîbistan û teknîkên romanê yên nûjen de serwest bin, her wiha divê di veguheztina bûyer û rîyalîteyê de rastîya detayan vebêjin û rewşa sîyasî, civakî û şoreşger a ku niha tê jîyîn, ber çav bigirin.

Di sedsala pîştan de gelek roman derketin holê, piranîya wan guhertinên civakî yê ku di encama şerê cîhanê yê duyemîn de rû dan, digirtin dest.

Ji romanên sedsala pîştan:

-Nostramo ya nivîskarê pole+ndî Coseph Conrad sala 1904.

-(Lêgerîna li Dema wînda) ya nivîskarê Fransîzî Marcel Proust, ji heft beşan pêk tê ku di navbera 1913 û 1927-an de hatine çap kirin.

-(The Great Gatsby) ya nivîskarê Emerîkî Scott Fitzgerald di 1925an de.

-(To lighthouse) ya Virginia Woolf a Brîtanî di sala 1927an deketîye.

-(Darizandin) ya nivîskarê Çîkî Franz Kafka di sala 1925an de derket.

-(Çîyayê sihrî) ji hêla nivîskarê Almanî Thomas Mann ve di sala 1924-an de hate weşandin.

(Nausea) ji hêla nivîskarê Fransîzî Jean-Paul Sartre di 1938-an hatîye nivîsandin.-

-(Xerîb) Albert Camus yê Firansîzî di 1942 de nivîsandîye.

-(1984) ya nivîskarê Brîtanî George Orwell di 1949an de.

-(Sedsala tecrîdê) ji hêla nivîskarê Kolombî Gabriel García Márquez di sala 1967-an de hatîye nivîsîn.

-(The Alchemist) ya nivîskarê Brazilian Paulo Coelho di sala 1988-an de.

Romana Kurdî:

- Romana (Şivanê Kurd) a ku ji hêla Erebe Şemo ve hatîye nivîsîn di sala 1930-an de bi Rûsî û di sala 1935-an ji bo Kurdî hatîye wergerandin, weke romana Kurdî ya yekemîn tê hesibandin. Di romanê de jîyan, ezmûn û têkoşîna xwe ya di

digre ku bi meh û salan dirêj dibe, lê çîrok demeke kurt û pir caran li cihekî tenê tê meşandin. Her wisa roman û deştan jî di hin taybetîyan de hevbeş in, herdu raştîya mirov û civakê vedibêjin, lê di zimanê vegotinê de cihêreng in, zimanê deştanê helbestî ye (Gilgamêş û Mem û Zîn), berevajî romanê ku ziman û şêwazê derbirinê yê pexşanî bi kar tîne. Deştan, bûyerên qehremanîyê nîşan dide û di cih û demeke deştî nîşan kirî de, û di meşandina bûyeran de demeke dirêj digre, lê roman dikare mijar û fikarên cihêreng ên civakê eşkere û ronî bike û di heman demê de bûyer bi lez tînin vegotin.

Her çend ew di warê peyvşazî û derbirinê de jî helbestê cuda be jî, lê romana raştî ew e ya ku di zimanê vegotinê de, şêwaz û rewanbêjîya helbestî bi kar tîne, da ku aştî vegotina wêjeyî û aştî derbirinê kêr nebe.

Derketina Romanê:

Roman bi teşeyê xwe yê wêjeyî yê ku di roja îroîn de heye, di sedsala şazdehan de derket, ji romanên deştîpêkê, romana Don Kîşot a De Cervants ê Ispanî bû, di du cildan de di navbera salên 1605- 1614z hate weşandin.

Di sedsala hevdehan de roman li Birîtanyayê derket bi romana Robinson Kirozo ya Daniel Defoe re di sala 1719an de.

Di sedsala 19an de roman li Ewropa û Emerîkayê geş bû û bi gelek cûryan derket (romantîk, dîrokî, psikolojî....hwd).

Li Rûsyayê du romannivîsên mezin derketin (Leo tolstoy û Fyodor Doştœyevsky).

Li Birîtanyayê romannivîsê bi navê Walter Scott derket û ji navdartirîn romanên wî (Wêvirlî) ya ku di sala 1814an de derket. Her wiha romana (Hejaran) a Victor Hugu di sala 1862an de derket.

Pêşekî

Roman



Desteya sernivîskariyê

Cudahî û Taybetîyên Romanê:

Tevî ku roman bi şêwaz û taybetîyên xwe yên cuda tê naskirin, lê di hin alîyan de, bi hunerên wêjeyî yên din re mîna çîrokê, hevbeş e. Ew û çîrokê di şêwzê pexşanî û pêkahateyên xwe de havbeş in, lê hin cudahî jî hene, Roman ji çîrokê dirêjtir e (rexnegiran, ji bo ku çîrok û romanê ji hev cuda bikin hejamra peyvên wan destnîşan kirine, hejmara peyvên çîrokê 1500- 30000 peyv, û yên romanê 40- 50 hezar peyv). Di romanê de hejmareke mezin ji karakterên sereke û navîn heye, berevajî çîrokê ku bi kesayeteke sereke û çend kesayetên din dikare peyama xwe ragihîne, her wiha roman serdemeke dirêj

● Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskarîyê)	44
● werger	
● Çayê Tev Lîmonê .. (Grîgorîy Gorîn-Wergera ji Rûsî: Şalîko Bêkes).....	47
● Huner	
● Li Ser Xeta Şanoyê Me.. (Ekîn Ronî)	49
● Çîrok	
● Rê.. (Qadir Egîd)	57
● Gîyanên Piçûk Koç Kirin.. (Hind Ebdelo)	60
● Helbest	
● Sara..... (Beşîrê Mele Newaf)	62
● Hêvîya Baskoyî.. (Rakan Hisso)	63
● Veger ..(Yûnis Bahram)	65
● Gurm e Gurm e.. (Ebûdê Mexso)	66
● Her dimînim ez.. (Lîlav Elî)	68
● Ez Qasim im ..(Cemîl Xoce)	69
● Serbest	
● Nirxandina Wêjeyê.. (Luqman Polat).....	70
● Gundê Heftêr .. (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir)	74

Naveroka Hejmarê

- **Pêşekî**
 - Roman.. (Desteya sernivîskarîyê) 5
- **Analîzên hizrî**
 - Roman Bi Xwe Şoreş e .. (Abdullah Ocelan) 9
- **Dosyaya hejmarê**
 - Roman.. (Dîyar Bohtî)..... 17
- **Lêkolîn**
 - Rola Wêje Di Civakê de û Jiyana Wêjeya Kurdî... (Merwan Berekat) 25
- **Hevpeyvîna hejmarê**
 - Li gel Nivîskar û Romannivîs “Helîm Yûsiv” e (Aram Hesen) 32
- **Jin û çand**
 - Jin û Romana Kurdî.. (Vejinî Kurd) 38
- **Pirtûkên derketî**
 - Romana Italo Calvîno ”Heger Rêwîyek Di Şeveke Zivîstanê De” û Heyama Post-Modernîzmê.. (Ersin Zengin)..... 41

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê aşt a keda çandî bilind bikin di rewşen herî dijar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî, herêmî û xwecihî tevî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbanîyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bideştixistina jiyanê demokrat û azad, ku nîrxên civakbûyîna yê bi hezarên salan rehen xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênuşên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî aşt bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bîngeh û hêzeke bandorker, ku aşt civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê gîrekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi gîştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşen awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê pişt re ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendêke dîrokî digre ku reseniyêke ramyarî û wêjeyî peyît dike, ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi gîştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şîyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şîyarkirîna de dike, her wiha veguhestîneke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi gîştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebi li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.

-Di 24 Êlûna 2018'an hatiye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7ê Sibata 2019'an de derket.

-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Cizîrê girtiye, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019'an Hatiye Dayîn.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.

-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nîrxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.

-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û politîkayên kovarê derbirin dikin.

-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tîn şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvên de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.

-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:

Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-çih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektirîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.

-Berhemên ku tîn şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bînîrx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yê ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yê civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:	Desteya sernivîskariyê:
Aram Hesen	Aram Hesen
Beşa hunerî:	Abdullah Şikakî
Rêvan Yûsiv	Ehmed Alyûsiv
	Fatma Sîdo

-Malpera kovarê:

www.shermola.net

-E-MAIL:

shermola2018@gmail.com

-Telefon û whatsapp:

0998149668

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.

-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.

-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.

- Nîrxê kovarê (1000 L.S).



Heykelê wêjevanê Kurd Mûsa Enter - Baxçeyê xwendinê - Qamişlo

ŞERMOLA



Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye

Hejmar: 7 Havîna 2020 z

Dosyaya Hejmarê

Girîngîya Romanê



Hevpeyvîna Hejmarê Li Gel
Romannivîs Helîm Yûsiv e

Rola Wêje Di Civakê de
û Jiyanê Wêjeya Kurdî

Jîn û Romana Kurdî